


# ROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



**QANATÊ KURDO 1909**

11  
1986

## NAVEROK

Jı Xwendevanan . . . . .	3
Me Qanatê Kurdo Windakir . . . . .	4
Qanatê Kurdo, Zimanzan, Kurdolog û	
Nıştimanperwereki Mezin Bû . . . . .	5
Nivisara Kurteberi ya Tarixa	
Kurdnasiya Rûsistan û Sovêtistanê . . . . .	8
Tê koşina Mehabadê Rê Nişani	
Me Dide . . . . .	12
Mihemed Arif Cıziri . . . . .	13
Cigerxwin Nemir e . . . . .	14
Encama Leca Helbest û Serpêhatiyan . . . . .	16
Celadet Bedırşan, Wek Himdare	
Elfabêya Latini-Kurdi . . . . .	22
Jı Zargotına Me -Dengbêj Kerem . . . . .	28
Şevê Biranina Cigerxwin . . . . .	29
Zargotına Kurdê Suriyê . . . . .	30
Jı Nav Weşanan . . . . .	31

Sal : 7  
Hejmar : 54

*Portreya li ser rûpelê pêşin : Belengaz*

XWEDİ : KOMKAR - Swêd  
BERPIRSİYAR : Şeroyê BOTAN  
NAVNIŞAN : Döbelnsgatan 16 B  
113 58 STOCKHOLM  
TELEFON : 08 / 32 82 51  
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska  
Arbetar Föreningen  
ANSVARIG UTGIVARE : S. BOTAN  
ADRESS : Döbelnsgatan 16 B  
113 STOCKHOLM  
TELEFON : 08 / 32 82 51  
PG : 458980 - 0

## JI XWENDEVANAN

### Elmanya

Redaksiyona Kovara Roja Nû'ra  
Hevalên Hêja

Hejmara Kovara Roja Nû hertim dikeve  
destê mun ez ji wê yekê pir kêf xweş dibüm  
û ji ber vê yekê pir sipas dikim û ji we ra si-  
lavêñ şorişgeri dibejim.

Hevalno ez bawerim ku xebatêñ Roja  
Nû naçe vala xebat û mijilbûna hevalên Roja  
Nû di tekoşin û diroka Kurdistanê da ciheke  
mezin digre. Wek em dizanîn edebiyat û  
çand bona wenateki wek welatê me bindest  
da ciheki giran bahaye. Eger niviskar û xwen-  
dêkarêñ kurdan li ser edabiyat û çanda Kur-  
dan nenuvisandina, niha edabiyat çanda  
kurdan ewqas pêşta nedîçû, tekoşina gel nav  
zemaneki teng da ewqas belav ne dibû, ewqas  
nedihat naskirin. Li hin komik û tevger teko-  
şina gel da cihê edebiyat û çandê baş fam  
nekirine, iro ji vê xebatê piçûk dibinin, vax-  
ta mirov qala xebata edabiyat û çandê dikin,  
ew rûyê xwe tirş dikin. Nizanîn ku iro çanda  
kurdan li hemberi kevneperekstan bûye mer-  
tal.

Xwendevaneke Roja nû  
KOLN-Elmania Federal

### Romanya

Silavêñ Şoreşgeri Jî Bo Kovara Roja Nû.  
Ez xorkeki Kurdîm li Romanyê dixwinim.  
Min rojekê kovara we Roja Nû li bal hevaleki  
dit û min gelek jê hez kîr. Ez Gelek hêvida-  
rim, weki hûn kovara Roja Nû tim û tim  
ji min ra bişinin.

Şewket Memut  
ROMANYA

### DAXUYANI

Xwendevanen delal,  
Navnişana "Roja Nû" û  
KOMKAR-Swêd hat guhar-  
tin.  
Navnişana me ya nû ev e:  
DOBELNSGATAN 16 B  
113 58 STOCKHOLM

### Awustralya

Redaksiyona Roja Nû ra;

Hevalên delal, min bihist ku mamosta  
Qanatê Kurdo çûye ser heqiya xwe.  
Lê bî rasti vê nûça reş ez geleki êşandim  
û ez dilreş, dilşin kîrim.

Min û mamosta roja 29-7-1983 yanda  
hevdu nas kîr. Lê tu caran ez bawer nakîm,  
ew mirovê xudan hêz, pêt, çawa feleka mal  
şewat ew ji, ji gelê Kurd ra pir dit, girt û bir.

Bî rasti vê nûça reş ez geleki dilşin û dil-  
reş kîrim. Xwestîna min ji redaksiyona Ro-  
ja Nû ra ewe ku, bî derheqa min da mesa-  
jekê ji bo serxweşiya malbata mamosta Qa-  
netê Kurdo, dî rûpelê Roja Nû da bê nivi-  
sandin.

Ez bî dil û can, malbata Qanatê Kurdo ra  
û hemû gelê Kurd ra serê we xweş bedibêm  
û silavêñ xwe yê birati rê dikim.

Gelê Kurd wi tu caran bir nake.

"Rizê canê Dersim"

Apê Qanat ji minra waha digot

Rıza ÇOLPAN

### Elmanya

Jî berpîrsiyarêñ "ROJA NÛ"ra

Em bî keserên dîlêñ xwe va serxweşî ji  
malbata mamoste û niviskarê Kurd Dr. Qa-  
natê Kurdo ra û ji gelê kurd ra dixwazin.

Mebî çûnamamoste û helbestvanê mezin  
Cigerxwin û filmçêkirê kurd yê bî nav û deng  
Yılmaz Guney ra reşî girê da bû.

Lê niha ev reşî pir teze bû, niviskar û ma-  
mosteyê me yê mezin Qanatê Kurdo ji çû  
ser heqiya xwe!

Em bî vê bûyerê ra ker û gêj bûn.

Lê, em bî serbilindi dîkarin bibêjin ku,  
wek di riya siyasetê da, weha ji bêje, çand û  
hunerên gelê me bî pêş da dumeşin û di ko-  
varêñ hêja yê mina "ROJA NÛ" û gelekên  
din da têñ naskirinê.

Ev lawêñ kurdêñ hêja û jêhati, yêñ mina  
Dr Qanadê Kurdo bî kar û hunerên xwe va  
hertim di nav dilê gel da wê biminin

Redaksiyona Kovara CİRAN  
Nûrnberg

---

# Me

## QANATÊ KURDO Windakir

Zimanzan û kurdolog, prof. Qanatê Kurdo, roja 31'ê Çiriya Pêşin, lı Leningrade çavên xwe lı jiyanê girt. Qanatê Kurdo 76 sali bû.

Mırına Qanatê Kurdo dı nav dost û hevalen wi da, dı nav kurdan da xem û berketîneke mezin peydakir. Bihayê xebat û xizmeten Qanatê Kurdo jı bo pêşveçuna ziman û çanda gelê Kurd bêhesab bîlind û hêja ye. Gelê me, wê vi lawê xwe yê mezin tucar jîbirneke.

Lı ser jiyanâ wi, xebat û efrandinêni wi, mîqala "QANATÊ KURDO - Zimanzan, Kurdolog û Niştimanperwerekî mezin bû" (Rohat rûpel 5) zêdetir agahdariyan dide.

Kovara Roja Nû û KOMKAR-Swêd, jı bo serxweşiyê, jı malbata Qanatê Kurdo ra ev mesajên jêrin şandin.

Jı Malbata Qanatê Kurdo ra;

Me xebera gelek tîrş û tal bîhist weki mamosta zana, ronakbirê navdar Qanatê Kurdo çûye ser heqîya xwe. Vê bûyerê em gelek êşandim. Mırına wi bona zuman, edebiyat û çanda kurdi, bona tekoşina gelê kurd ziyanekê mezine.

Kovara Roja Nû jı ber mırına Qanatê Kurdo êşa xwe, kesera xwe nîkare bine ziman. Bona pêşketîna ziman û çanda kurdi bî camêri û dostani destê xwe gîhandiye me û bûye yek jî me. Bîla serê we û serê gelê kurd saxbe.

Redaksiyona Roja Nû

Jı Malbata Qanatê Kurdo ra;

Em karkerên Kurdistanê jı ber mırına mamostayê mezin Qanatê KURDO gelek rûsar û xemginin û êşa me kûre. Dema ku me ev xebera reş bîhist bî rasti em gelek berxwe ketm. Jı ber ku mirovên wek Qanatê KURDO rûmet, serbilindiya menin. Wi hertim jı bo bîlîndbûna tekoşina karkeran û bîlîndbûna giyanê Kurd yê netewi bê westan bî qelema xwe, bî zanina xwe şerkîriye. Disa em wê yekê jî baş dizanın weki Qanatê Kurdo dema şerê cihanê yê duwemin çek silah daye destê xwe jı bona parastuna mafêñ karke-rêñ cihanê, lı diji Hitlervanan ketiye nav şerê germ. Miroveki mîrxas, zana welatparêz, internasyonalist wek Qanatê Kurdo hertim wê dî dîlê me da, dî dîlê gelê kurd da ciyeki germ bigre. Em jı we ra serxweşiyê hêvi dikin û êş û jana we parvadîkm.

KOMKAR - Swêd

# Qanatê Kurdo


ZIMANZAN, KURDOLOG Û NIŞTAMANPERWEREKİ MEZİN BÜ...

## ROHAT

Zimanzan, kurdolog, zana û niştamanperweré mezin Qanadê Kurdo dî 76 saliya xwe da li bajarê Leningradê ji nav me bar kir û çû dilovaniya xwe. Wi dî nav vê jiyina dûr û dirêj da bî taybeti ji bo pêştabırına nivisan-dina pirtükên gramatiki ji bo zarokan, amadekrina kadroyên kurdzanan û wek alikariya pêşketina karên çand û huner li dervayı welat bî sedan efrandinê berketi pêşkeşî gelê Kurd kir. Dî vi wari da Qanadê Kurdo ji sedi zêtir pirtük, bend û materiyalên mayin amadekir, wek definekê ji me ra hişt.

Qanadê Kurdo dî sala 1909'an da li nehiya Susizê (Niha dî nav erdê Kurdistana Tirkîyê da) ji diya xwe bûye. Qanad dî dawiya Şerê Cihanêyi Yekemin da bî tevi malbat û pizmamên xwe dî sala 1918'an da bar dîkin diçme Ermenistanê, Qanad dî nav jiyineke dijwar, çetin û belengaz da rojêن xwe derbaz dike.

Dî sala 1928'an da Qanadê Kurdo û çend kesêن din, ji bo xwendîna bilind diçine bajarê Leningradê û dikevine Fakulta Palan, li wir dixwinin. Qanadê Kurdo dî nav salêن xwendîna xwe yabilindda dibe xwendekareki zirek, jêhati, çavvekiri û serfiraz. Ev yeka ji ber çavên mamosteyên wi nareve. Mamosteyêن wi kesine nav û deng bûn, şareza, rohilatzan, zimanzanêن jêhati bûn. Şansê Qanad dî vi warê da gelek mezin bû, wek N.Y.Mar, I.A.Orbelli û A.A. Freyman. Qanad dî sala 1938'an da xwendîna xwe diqedine. Mamosteyêن wi bîryar dîgirin weki ew dî fakultê da bimine, karên xwe yên zanisti bajo, bîbe kurdzan. Ew bî taybeti li ser karên zimanê kurdi serê xwe diêşine, dî vê tangê da karên xwe dajo. Qanad paşê bî navê "sazmanîya Çêkîrîna Fêlén Bargiran Dî Zimanê Kurdi Da" xebatekê amade dike.



Dî sala 1959'an da cara pêşin li Leningradê pêşengîya rohilatzanê mezin İ.A. Orbelli beşa kurdzaniyê tê vekîrin û Orbelli dîbe serokê vê sazgehê. Çawa tê zanin vekirîna vê besê wê dî paşwextiyê (duwaroj) da roleke mezin bilize. Dî sala 1961'an da İ.A. Orbelli diçê dilovaniya xwe û vê carê şagirtê wi Qanadê Kurdo şuna mamosteyê xwe tiji dike, ew dibe serokê vê beşa Kürdzaniyê. Heta roja mirîna xwe ji Qanad li ser vi kari bû, Qanad nêziki 24 salan ev kara ajot, kar û xebatîne hêja pêkani.

Qanadê Kurdo dî sala 1960'an da li Sovyetê tevi Kongra Rohilatnasên Cihanê dibe û raporekê dide.

Piştî sala 1970'an bîryar girtin weki Qanadê Kurdo bîbe mamosteyê Akademiya Kurd li Iraqê. Wi dî navbera van 15 salan da, heta roja mirîna xwe ji alikariya pêşketina çanda Kurdi li Iraqê kiriye û li Iraqê gelek baş hatîye naskîrin.

Qanad dî nav ronakbir û karkerêن Kurdistana Tirkîyê da ji baş hatîye naskîrin. Wi hertim cedandiye weki pêwendî û dostaniya xwe li gel rêxistinêن Kurd li dervayı welat,

yên sosyalist welatparêz xurt bîke. Qanadê Kurdo hertim piştgiriya xwe li gel van rêxistinan nişan daye û bî wan ra karkiriye, dî nav rûpelên weşanê van rêxistinan da gelek ni-visarêni wi hatine weşandin. Pirtûkêni wi ji aliyê weşanêni ROJA NÛ û weşanêni KOM-KAR da hatine neşirkirin û belavkirin û gihiştine destê bî hezaran ronakbir û karkeren kurd li dervayi welat. Qanatê Kurdo her wusa bûye himdareki Enstituya Kurdi Lî Parisê.

Bî vi tehri navê Qanatê Kurdo ji welatê Sovyet, ji sinorêni Sovyet hingavtiye, xwe gihandiye hemû besêni cihanê.

Mirov dikare kar û barêni Qanad, şaxışiyeta wi, daxwaz û planêni wi yên naveroka efrandinêni wi, dî nav rûpelên pirtukekê da analiz bîke, binivise û pêşkêşî xwendevanan bîke, mirov nikare vi lawê Kurdi dî nav du-sê rûpelên vê kovarê da bide nasin, ev yeka gelek dijware.

— Zimanzan Qanatê Kurdo çawa tê zanin bingeha karêni xwe bî taybeti li ser pêşketina zimanê kurdi daniye. Piraniya kar û xebatêni Qanad li ser vê pirsêne. Dî warê nasin, analiz-kirin û nivisandina zimanê Kurdi, bi çaveki sistematik ji hev derxistina qaydeyên zîmin bî destê Qanadê Kurdo bi firehi hatine zelalkirin, hatine nivisandin. Mirov dikare van karan ji li ser xalêni jêrin pareveke.

a) Danasina gramatika zimanê Kurdi, ji bo kasêni zana, pispor û zimanzan, ji aliyê din da ji bo zarokan. Dî vi wari da gelek pirtük û lêkolinêni hêja amadekiriye.

b) Dî warê amadekirina ferhengên Kurdi da Qanadê Kurdo bî jêhati kar kiriye. Wi hewcedariya ferhengên Kurdi û zimaneki mayin (bî du ziman) pêwist ditiye. Qanad ev ferhengana bi çaveki zanisti amadekiriye. Li ser rûpelên ferhengan, wi karekteren navan wek maskûlin an ji feminin nişan kiriye, dî ferhengan da hebûna her peyvekê nişan kiriye wek nav, cinav, fêl. Dî ferhengên xwe da Qanad ji bo zelalbûn û baş têgiştina hin peyvan, dî bin van peyvan da, ev peyv dî nav hevokan (cumle) da dane xebitandinê. Qanadê Kurdo dî warê amadekirina ferhengên Kurdi da efrandinêni baş ji me ra hiştiye. (Ferhenga Kurdi-Rusi. 1960, ferhenga Kurdi-Rusi. 1983-Sorani)

c) Qanadê Kurdo ji bo vekolina bingehêni zaravêni Kurdi (dialek) wek kurmanci, sorani û zazaki gelek efrandinêni hêja pêkanina. Cudati û nêzikayêni van zaravan çine, cihêwan dî zimanê kurdi da baş nişan daye.

Ev yeka ji beşeke xebata Qanadê Kurdo ya mezine. Pirtûka wi ya bî navê "Angori Materiyalêni Kurmanci û Sorani Gramatika Zîmanê Kurdi" (1978). Qanad dî vê pirtûka xwe da her du zaravêni bingehin rûbarihev dike.

Ev pirtûka wê dî demeke nêzik da dî nav weşanêni Roja Nû da çap bibe.

— Qanadê Kurdo Kurdzanekei mezin bû. Jî ber ku Qanadê Kurdo ne tenê li ser zimanê kurdi xebitiye, ew wusan ji gelek salan li ser çand, etnografiya, zargotin, edebiyat û gelek pirsêni kurdzaniye yên mayin va mijûl bûye. Diroka Kurdzaniye (Kurdologi) li Yekitiya Sovyet û li Dervay welat baş vekolandîye û gelek tiştêni hêja li ser pîrsa kurdzaniye nivisiye.

— Ew wusan ji mamoste û perwerdekareki, jêhati bû, tenê li Leningrade li ber destê wi nezkaya 20 zimanzan, kurdzan gihiştine û ew bûne zane û pisporêni jêhati. Bî vê yekê va girêdayi em dîkarin bêjîn, Qanadê Kurdo tenê nenivisiye, dî nav rûpelên pirtûkan da rojêni xwe derbaz nekiriye. Jî bo vê yekê, mirov dikare bêje ew organizatorek bû.

Qanadê Kurdo ji aliyê din dosteki kovara me - Roja Nû yê mezin bû. Gelek nivisarêni Qanadê Kurdo yên Kurdzaniye dî nav rûpelên kovara Roja Nû da çap bûne. Wusan ji pirtûka wi ya hêja "Tarixa Edebyeta Kurdi" dî nav weşanêni Roja Nû da hatiye çapkırın.

#### Navêni Çend Efrandinêni Qanadê Kurdo

1. Gramatika Zîmanê Kurdi, Leningrad. 1957, bî Rûsi
2. Gramatika Zîmanê Kurdi, Bona komên (sinif) 5-8'an, Erevan 1960
- 3) Ferhenga Kurdi-Rûsi (34.000 pevv) 1960 Moskova
- 4' Zîmanê Kurdi, Kitêba Dersan Bona Komên 3-4, 1979. Erevan
5. Gramatika Zîmanê Kurdi Angori Materiyalêni zaravêni Kurmanci i Sorani, 1978 Moskova
6. Zîmanê Kurdi (Rêzman) Frankfurt 1981.
7. Ferhenga Kurdi-Rusi (Sorani) 1983 Moskova
8. Tarixa Edebiyata Kurdi (Cild 1) 1983 Stockholm.
9. Tarixa Edebiyata Kurdi (Cild 2) 1985 Stockholm

### Efrandinên Ku Çapxanêdane

1. Lêgerina Zaza (Lêgerina Zaravêن-Kurdi)
2. Tekstên Folklora Kurdi. Bî Rûsi
3. Kilamêن Evintiyê (Bî J.Musaelyan va tevayı)
4. Çapkirina Mem û Zina Ahmedê Xani li Stenbolê
- 5) Tarixa Kurdnasiyê Rusistan û Sovyetistânê.

### Çend Destnivisarê Wi

1. Folklora Kurdên Azerbeycanê (B.S. Eskerov ra tevayı)
2. Derheqa Navêن Jîn û Mêran
3. Beyt û Destanên Kurdi
4. Bir û Bawera Kurdewari Lî Folklora Kurdi da
5. Sazmâniya Çêkîrîna Peyvan li Zimanê Kurdi da

### Çend Nîvisarê: Qanatê Kurdo Dî Kovareñ Cuda-Cuda

- Pîrsêن pêşveçûna Litteratura Zimanê Kurdi, Riya Teze Hejmar 31, 1933 Erivan
- Pîrsêن Rastnivisandina Zimanê Kurdi, Riya Teze Hejmar 58, 1955, Erivan

— Rexnegiriya Baweriyêن Şaş û Xelet Derheqa Zimanê Kurdi Da, Kovara Melümetiyên Kurd yên Enstutiya Rohilatzaniyê, 1955 Moskova

— Xaçatur Aboyan Etnograf û Kurdnas Bû, Kovara Akademiya Zanisti ya Ermenistanê, Rêza Zanistêن Cîvaki, 1955 Erivan

— Kongra Rohilatzaniyê, Riya Teze 1960 Erivan

— Diroka Nîvisandina Ferhengên Kurdi, Ronahi, hejmar 7, 8, 9-10 1961 Bexdat

— Ahmedê Xani û Efrandinê Wi, Ronahi Hejmar 8 Bexdat 1961

— Kurdnasi Lî Leningradê, Ronahi Hejmar 6, 7 Bexdat 1961

— Kitêb û Bendên Kurdnasiyê, Çiya Hejmar 6, 7 1968 Berlin

— Nîvisarê Akademiya Kurdi Zanisti ya Iraqê, Riya Teze, Hejmar 82, 1973 Erivan

— Lêgerina Litteratura Kurdi Lî Iraqê, Kovara Gelêن Asiyê û Afrikê, Moskova 1975

— Kurd Ne Türk, Ne Ji Farsêñ Serê Çiyanê, Dengê KOMKAR, hejmar 33-34, 1981 Frankfurt

— Pertokêñ Hêja û Gîranbiha, Berbang Hejmar 2 1985

— Du Gili Lî Ser Peyvêñ Sinonim, Roja Nû Hejmar 5, Stockholm 1985

— Disertasiyên Kurdnasiyê, Roja Nû Hejmar 8, 10, 1985 Stockholm

# Nîvisara kurteberi ya tarixa kurdnasiya Rûsistan û Sovêtistanê

Prof. Qanatê KURDO

Dı sedsaliya 18'da welatên pişt Kavkazê (Ermenistan, Azêrbecan û Gurcistan û welatên din) ketibûn bin desâtê impériya Rûsistanê. Hela hê dı wê zemani da zanyar û ulmdarêñ rûsan, rêbar û gêografêñ rûsan bî hewasdarike mezin mijûli lêgerina zîman, tarix û kultûra wan dibûn. Ew wusan ji mijûli lêgerina miletê kurd dibûn. Dı wi zemani da pevgirêdana impériya Rûsistanê bî welatê farsan û impériya türkê osmani ra hebû. Rûsistanê bî dewletan ra kîrin-firotin dîkîr, pevgirêdana Rûsistanê ya aboriyê, malhebûnê bî wan ra hebû, sebeb vê yekê lazîm bû herdu welatan rînd nas bikin, zîman, tarix û kultûra miletêñ herdu welatan zanibin. Lema ji zanyar, rêbar û gêografêñ rûsan dest pê kîrin mijûli lêgerina zîmanê tîrkan, farsan bûn, mijûli şaristaniya wan müsulmaniyê û gêografiya welatê wan bûn. Hema hîngê ji zanyar, rêbar û gêografêñ rûsan dest pê kîrin mijûli lêgerina zîmanê kurdan û welatê kurdan bûn. Paşê lî rûsistanê wextê şerê rûs û tîrkan, rûs û farsan pê diheşin, ku gelek taxbûr û komên qebil û eşirêñ kurdan naxwezin tevi tîrkan, farsan pêşberi eskerêñ rûsan şer bikin, derbazi aliyê eskerê rûsan dibin; hîngê zanyarêñ rûsan dest pê dîkîn bî mexsûsi mijûli lêgerina kurdan, qebil û eşirêñ kurdan û welatêñ kurdan dibin.

Hema hîngê, nîvê sedsaliya 19 xebata wan lî ser kurdan û Kurdistanê gumreh dîbe. Wi wexti xebatêñ tarixi, êtnografi yên Ditêl, Aboyan û Bêrêzin derheqa kurdan da têne çapkirinê (binêre, navnişen kîtêb û pertok û nîviştokên derheqa kurdan da).

Paşê, lî kutabûna sedsaliya 19 û lî destpêka sedsaliya 20'a, dı kovar û rojnamêñ rûsan da nîvisar, nîviştokên ditinê derheqa kurdan û rola kurdan ya eskeri û politiki lî şerê rûs û tîrkan, lî şerê rûs û farsan da çap dîkîn. Hîngê bî mexsûsi materialê bî vi cûreyi lî nîvisarêñ Trottêr da "Maloaziatskiye Kurdi" (yanê, kurdêñ lî Asiya biçük), yên Lixûtin da "Rûskiyêv Aziatskoy Tûrsi" (yanê, rûs lî Asiya Türkiyê da), yê Kamsarakan da "Vastaniyê şeyxa Abduli" (yanê, Rabuna Şêx Ebdule), materialê Karsêv "Zamêtki o kûrdax" (yanê, Nîviştokên ditinê derheqa kurdan da), yê Kolûbyakin "Sostav nasêlêniya po plêmênam i provinsiam Pêrsii" (yanê rûniştvanêñ Persiyê yên qebilêñ erdê Pêrsi-Ecemistanê), yê Minorskii "nîviştokên ditinê derheqa kurdan da), meterialê Xanikov "Poêzdkâ v Pêrsidkii Kûrdistan" (Yanê çûyin û gerinê lî Kurdistanâ Ecemistanê da) û yên din. Dı van nîvisaran da derheqa halê kurdan politiki da û derheqa şerê wani azadari pêşberi

hukmeta Tîrkiyê û şahê Iranê da dîn-visin. Bî vi cûreyi ji kîtêba V. Nikitin "Kurdi v voynax Rosii s Tursiley i persiyey" (yanê rola kurdan li şerê turk û rusan da, fars û rusan da) hatiye çapkırınê. Hema hingê li nav zanyarên rûsan da fikra bî kopliks lêgerina kurdan peyda dîbe û bî zanyari bî pîrsa lêgerina kurdan mijûl dîbin. Lî nivê sedsaliya XIX dest pêdikin xebatê zanyari li ser ziman, litératur, folklor û tarix êtnografiya miletê kurd çap dikin. Xebatêni vi cûreyi yên hingê çap bûyi yên Dîtel, Abovyan, Lêrx, Bêrêzin bûn. Bî danepêşa zanyarên rûsan Dorn, Brosse, Betling, Zaleman, Kûnnik û Kepping Akademiya Rûsistane li nivê sedsaliya XIX'da P.I.Lêrx dîke ser karê akademiyê û dispêre wi xebata xwe nivisar derheqa kurdan da xîlas bike û here cem kurdên bî hêsr a-ni bûne Roslavê, hini ziman êtnografiya wan be. Lêrx wê xebetê bî serfin-yaz dîqedine.

Hema dî wi wextida serokê Mûzêxana Asiyê akadêmik Dorn û akadêmîkê erebnas û farsnas K.Zalêman dispêr-ne baylozê rûsan A.Jaba li Erzurumê destnivisarên bî zimanê kurdî kom bike û bisine Pêtêrbûrgê. A.Jaba wê spartinê bî serfin-yaz dîqedine, destnivisarên kurdî yên tarixi, ziman, litératûri, folklori û etnografi bî ari-kariya zanyarên kurdî kom dîke û dîsine Pêtêrbûrgê.

Bî vi teheri li nivê sedsaliya XIX-da bînyat û bîmaxa kurdnasiya Rûsistane tê daninê û dî sistema akademiya Rûsistane û dest pê dikin bî sistemi û pilani mijûli lêgerina ziman, litératûr, folklor û êtnografiya kurda dîbin. Akademiya Rûsistane hingê ev xebatên jêrin çap kîrine: nivisara P.I.Lêrx Isslê-dovaniya o kûrdax i ix prêdkax sêver-

nix xaldeyax (I856,I857,I858), tercîma kîtêba Şerefxan Bîtlisi Tarixa Kurdan (tercîma Velyaminov-Zernov û bî nasi-nivisara Şarmûa), Kîtêbên A.Jaba ferhenga Kurdi-fransizi, berevoka çiro-kên kurdi diroki, rêzmanâ F.Yûsti, du berevokên folklorâ kurdi yên Albert Sosin bî tercîma zimanê almani û yên din.

Bî çapkırına van xebata û komkırına destnivisarên kurdî Akademiya Rûsistane li nivê sedsaliya XIX bînyata pêş-veçûna kurdnasiyê datine. Hingê ji dî rex vi kari da gelek nivisar, pertok û nivîstokên zanyar, êtnograf û rêber-rêrîn rûsistane derheqa miletê kurda li kovar û rojnamê û kîtêban da çap dîkirin. Navnişa wan nivisara, wan kîtêb û kovaran li bibliografiya kurdnasiyêda ya kû J.S.Mûsaelyan çapkiriye, yeko-yeko hatiye nivisandinê. Dî wê bibliografiyêda heta 2610 navê kîtêb, pertok, nivisar û nivîstok yên ku têda derheqa kurdan da hatine nivisandinê, çap bûne. Lî Rûsistane da û Sovyetistanê da hatine çap kîrinê. Eger em hejmara kîtêb, pertok û nivisarên rûsi hemberi kîtêb û nivisarên biyaniyan (ejnebiyan) bikin, emê pê bîhesin, ku bî zimanê rûsi ji hemû ziman an pirtir kîtêb, nivisar derheqa kurdan da hatine çapkırınê. Eva yeka nişan dîke, ku li Rûsistane da û Sovjetistanê da kurdnasiyê li dînyayê da ciyê pêşin girtiye.

Lî beri û paşı Şorişa Oktobra mezin rohilatnasen eyan û bî navdar N. Y. Marr, V. A. Gordlevski û İ.A. Orbeli mijûli lêgerina kurdan dîbûn, xwe bî edetê(tradisiya) zanyara rûsiva digirin. N. Y. Marr dî xebata xweda "Ye-şo raz o solvê çêlêbid" (derheqa rola miletê kurd li tarixa miletê Asiya Pêşin da) û gelek pîrsen din bî hewasar nivisine; V.A. Gordlevski nivisar û pertokên

tarixi- êtnografi lı ser kurdan çap kırine, lê İ.A.Orbêli çû bû cem kurdên nehiya Moksê, gelek matêrialê êtnografi kom kîrin û ferhenga Kurdi - Rusi ya xeberên kurdên Rayona Moksê nivisye.

Lı paşı Şorîşa Oktobrê kurdnasi bi carekê va dest pê na be. Lı welatê Sovetistanêda heta sala 1940 Mar, Gordlevski , Orbeli û çend kesên din kurdnasiyê va mijûl dibûn.

Sala 1937 lı institûta rohilatnasê da ya Akademiyê da her bî tenê Rastopçin mijûli lêgerina kurdan dibû. Ewi "Bibliografiya po kûrdskoy probleme" (yanê, Bibliografiya mesela kurdan) sala 1932 çap kiriye. Lı sala 1930 heta sala 1937 pêşiyê lı institûta "Yazika i mişlêniya" ya akademiya, û paşê lı institûta êtnografiyê da ya akademiya Sovetistanê da O.L.Vilçevski dixebeit; ewi çend nivi sar derheqa ziman, êtnografiya miletê kurd da çap kîrine, paşê sala 1960 ewi kitêba xwe "Kûrdi" (Peydabûna kurdan) çapkîr.

Lı Moskovayê da B.V.Millér mijûli lêgerina kurdan dibû. Ewi ji çend nivisarên biçük derheqa ziman û literatûra kurdan da çap kîrine. Lı Erêvanê da Eminê Evdal û Haciye Cindi, yên ku zanineha Erêvanê ya dewletê xîlas kîribûn, mijûli lêgerina folklor û êtnografiya kurdan dibûn. Wi wexti lı Ermenistanê da bî pirani mijûli vekirina dîbistanê kurdi û çapkîrına kîtêbên bî zimanê kurdi dibûn bona kurdên Ermenistanê.

Lı Bakûyê zanyarêñ rûsan êtnograf Çûrsin, Bûkşman û yên din çend nivisar û pertok derheqa kurdên Azîrbe-canê çap kîrine. Her lı sala 1930 da lı welatê Sovetistanê da dest pê dikin kadroyêñ kurdnas hazır dikin. Lı zanineha Leningradê da lı fakültêta filologiyê da saya serê profesor A.A.

Freyman û İ.A.Orbeli beşa kurdi tê vekirinê.

Lı çilsaliyê da (1940) Eminê Evdal, Hecîyê Cindi dîsertasiya xwê lı ser folklor u êtnografiya kurdi pawan kîrin, lı Leningradê da sê şagirtên Frêyman, Orbeli dîsertasiya xwe derheqa zimanê kurdi da pawan kîrin. Ew herse kes yek ez bûm, yek Avaliani bû, yê din ji Sûkerman bû. Bî vi teheri lı nav cil saliyê da weka heft merivan mijûli kurdnasiyê dibûn, lê disan hîngê her yek ji wan lı diwanxanan da cuda dixebeitin.

Her lı nav salêñ 1960 da, lı Sovetistana da zemaneki teze yê serxwebûn û pêşveçûna kurdnasiyê dest pê dike. Hema xût lı nav wan salan da lı Leningradê, Erêvanê û Bakuyê lı institûtêñ akadêmiya yên rohilatnasiyê da komêñ kurdnasiyê têne sazkîrinê û hemâ dî wi zemani da kurdnasiya welatê me bî çivanêñ rasteberi mina pareke (beşeke) rohilatnasiya Sovetistanê bî xebata xwe va mijûl dîbe û dî nav rohilatnasiya Sovetistanê da ciyê xwe bî layiq digire û pêşva diçe.

Lı sala 1980 da serweriya institûta rohilatnasiyê ya akadêmiyê lı Moskovayê komeke zanyaran saz kîr bona lêgerina mesele û pirsên kurdnasiyê. Bî vi teheri niha lı Sovetisttanê da çar komêñ kurdnasiyê hene. Bî sazmankîrina komêñ kurdnasiyê lı Sovetistanê da dest pê dikin bî sistematik û planweri mijûli problemêñ kurdnasiyê dibin.

Niha lı Sovetistanê da weke 29 zanyar mijûli pirsên kurdnasiyê dibin. Jî wan 29 zanyaran 7 meriv doktorên zanyarêne, yên din kandidatê zanyarêne. Jî wan 29 kesan donzde kes dirokñasın (tarixnasın). Jî wan yek lı Leningradê dixebite, pênc kes lı Erêva-

nê dixebitin, yê din ji lı Moskovayê.

8 zanyar lı ser lêgerina zimanê kurdî dixebitin. Jı wan zanyaran çar kes lı Leningradê dixebitin Q.Kurdo, Z.Yûsûpova - lı institûta Rohilatnasiyê da, Kerim Eyûbi û İ.Smirnova - lı institûta zimanzaninê da, R.Sabolv- lı institûta rohilatnasiyê da, yek lı Êrêvanê - lı institûta rohilatnasiyê da M.Xamoyan dixebite, yek ji lı Semerkandê, Avaliani lı zaningeha Semerkandê dixebite.

Du meriv lı ser êtnografiya kurdan dixebitin - lı institûta êtnografiyê lı Moskovayê, yek ji lı Êrêvanê lı institûta rohilatnasiyê da. Çar zanyar ji lı ser literatûra kurdan dixebitin, lı Bakûyê lı institûta rohilatnasiyê da Alişanov, Şafiyêva, Askerov dixebitin, lı Moskovayê lı institûta rohilatnasiyê da Cimşit Heyderi dixebite. Lı ser Komkîrin, çapkîrin û lêgerina folklora kurdi 5 meriv dixebitin, lı Êrêvanê Haciyê Cindi, Nûrê Cewari, Cemila Celil, lı Leningradê O.Celil û J.Mûsaelyan lı institûta rohilatnasiyê da dixebitin.

Lı nav çıl sali da (ji sala 1940 heta sala 1980) kurdnasiya Sovetistanê ji 60 zêde kîtêb, pertok, nivîstokên zanyari lı ser lêgerina tarix, ziman, edeb-yet, folklor û êtnografiya neteweyê kurd çap kîrine. Jı wê hejmarê weke 17 kîtêb lı ser lêgerina zimanê kurdi çap kîrine, 10 kîtêb lı ser lêgerina dirokê çap kîrine, 10 lı ser literatûra kurdi çap kîrine, 19 kîtêb lı ser folklo-ra kurdi çap kîrine, 6 kîtêb û pertok lı ser êtnografiya kurdan çapkîrine.

Xebatêni zimanzanêndan bî pîrani derheqa veguherina navan, peydabûna formen hejmaran yê guhastina wan lı ser komên naven esli jin û esli mîr û wusan ji lı ser veguherina fêlan

sazbûna wext û teherê kîrînê hatine çapkîrinê. Xebatêni wan bî pîrani lı ser van pîrsen jêrin hatine çapkîrinê:

Nîvisandina kîtêb û pertokên lı ser rîzmana kurdi.

Nîvisandina ferhengen kurdi.

Nîvisandin û lêgerina şov (şive) û zaravêni kurdi.

Ev pîrs lı nîvisarêni Ç.X.Bakaev da "Zaravê kurdên Turkmenistanê, zimanê kurdên Azerbecanê", pertoka "Rêzmanê kurdi da", lı nîvisarêni Y. Avaliani da lı "Veguherina formen fêlan dı zimanê kurdi da" û "Lı ser saz-maniya hevokên fêlên bargiran" da, nîvisarêni İ.Sûkerman "Lı ser veguherina formen navan" û "Lı ser sazbûn û veguherina fêlan dı kurmanci da" û nîvisarêni Q.Kurdo (rêzmanen kurmanci yê salen 1949, 1956, 1960, 1970 bî zimanê kurmanci û rîzmana kurmanci bî zimanê rûsi ya sala 1957, 1978 da hatine çapkîrinê.

Lı dereca nîvisandin û çapkîrina ferhengen kurdi gerek bêjîm, ku ziman-zanen me çend ferheng çapkîrine. Na-vê wan eve:

Xebernama Zimanê Fileyi û Kurmanci, 1933, Rewan.

Kurdsko-Ruskiy Slovar (Ferhenga Kurdi û Rûsi), Ç.X.Bakaev, 1957, Moskova.

Rusko - Kurdskiy Slovar (Ferhenga Rûsi û Kurdi), İ.O.Farizov, 1957, Moskova.

Kurdskiy - Ruskiy Slovar (Ferhenga Kurdi - Rûsi), Qanatê Kurdo, 1960, Moskova.

Kurdsko - Ruskiy Slovar (Sorani) (Ferhenga Kurdi - Rûsi), Qanatê Kurdo, Zera Usiv, 1983, Moskova.



**DI SER DAMEZRANDINA KOMARA MEHABAD'Ê RA 40 SAL DERBASBÜ**

## Têkoşina **MEHABAD'Ê** Rê Nişanê Me Dike

Îsal dî ser damezrandina Komara Mehabad'ê ra 40 sal derbazbû. Komara Mehabad'ê bî pêşengiya Parti Demokrati Kurdistani Iran, di roja 22'ê meha Çileyê Paşin da hat damezrandin.

Lî dawiya Şerê Cihanê Duwemin, bî pêşengiya Yekitiya Sovyet, hêzên aşti-xwaz û demokrasixwaz zora faşizmê birin, faşizm hilweşiya. Hin dî destpeka şerê cihanê duwemin da, Yekitiya Sovyet li gor peymana 1921'a, jî bo qehimkirina sinorêñ

xwe li diji êrisêñ hêzên faşist yên Elman, mecbûr ma, leşkerêñ xwe şande nav erdê Iranê. Wê demê Ingiliz ji ji başûr ketübûne Iranê û li Iranê derbeke faşist çêbibû. Gel li diji faşizmê têkoşineke xurt da û diktatiriya Rıza Şah helweşiya. Wê demê li Iranê gelek partiyêni siyasi û rêxistinê demokratik hatin damezrandin.

Dî sala 1941'an da Hîzbî Tuđeh û paşê li Kurdistanê ji KOMEL hat damezrandin û Qadi Mihemed bû endamê Komel'ê.

Dema leşkerêñ Iranê ji Kurdistanê kîşîyan, çek û silahêñ xwe hiştin û hemû çek ketin destê Kurdan.

Dî wê demê da, danûstandinê Kurdan bî Yekitiya Sovyet ra xurt bû. Lî Azerbeycanê ji bi pêşengiya Tuđeh û piştgiriya Yekitiya Sovyet, Komara Azerbeycanê hat damezrandin. Dî vê navberê da Komel'ê ji, jî aliyê civaki û rêxistini karêñ xwen yên siyasi pêşa bir. Dî sala 1945'an da, lî ser ximêñ Komel'ê Parti Demokrati Kurdistani Iran

hat damezrandin.

Dı sala 1946'an, meha Çileyê Paşin da, li meydana Çuwarçira, Qadi Mihammed damezrandina Komara Mehabad'ê ilan kır û bû serokê Komarê.

Dı destpêka salên şerê cihanê duwemin da heta helweşandina Komara Mehabad'ê, çawa ji aliyê rêxistini usa ji ji aliyê huner, çand û belavkirina weşanên kurdi da, pêşveçûneke mezin li Kurdistanana Iranê pêk hat. Bir û baweriya welatparêzi gihişte merheleke bilind. Dı vi wari da ronakbir û niviskarêni Kurd yên pêşverû û weşanên kurdi roleke mezin leyist. Xêni ji Kovara "NIŞTIMAN", organa resmi, rojnama "KURDISTAN" û dı sala 1946'an da "Halale", "Dengê Welat" û hwd. hatin weşandin.

Pêşandana tiyatro, piyesa bî navê "DAYKİ NIŞTIMAN" vebûna Dibistana Bilind ji bo keçan, ev hemû tiştên nûjen,

yet gavêñ hêja bûn dî jiyanâ gelê Kurd ya nû da.

Dema ku Yekitiya Sovyet, leşkerêni xwe ji Iranê kişand, hukumeta Iranê êriş ani ser Azerbeycan û Kurdistanê. Herdu Komar ji nekarin ji êrişa Iraniyan xwe biparêzin. Berê Azerbeycan, paşê ji Mehabad ket, pêşengêni Komarê : Qadi Mihemed, serokvelil Heci Baba û wezirê şer Seyfi Qadi roja 31 Adarê 1947'an da hatin dardakirin.

Komara Mehabadê, di diroka Kurdistanê da ciheki giring digre û tucar nayê jibirkirin.

Dı ser hilweşandina Komara Mehabadê ra 40 sal derbazbû. Lê agirê azadiyê li Kurdistanê venemiri, iro ji gelê me li Kurdsitana Iranê, li hember êrişen rejima kevneperest şerê çekdari dajo. Doza azadiyê ku ji Yezdan Şêr, Qadi Mihammed heta iro domkur hat iro hin ji xurt dibe û xewnenê dijminen neteweyê Kurd direvine.

## mihemed arif cizrawi



Dengbêjê bî nav û deng, Mihemed Arif Ciziri, isal kete 73 saliya xwe. Ew nuha li bajarê Dihokê (Kurdistan Iraquê) diji.

Mihemed Arif Ciziri, li Cizira Botan, dî nav malbateke xizan da hatiye dinya-yê. Çawa ew bî xwe dibêje , wi dî 14 saliya xwe da dest bî tembûrê û stranbêjiyê kuriye û ji wê salê heta nuha, stranbêji ji wi ra bûye pêse û mijûli. Weha dîbêje:

— Ez 15-16 sali bûm çûme Dihokê. Lî wir ez û hevalê mi Hesen Cizrawi - ku ew bî xwe ji stranbêjeki heskiri ye -, em li gundan, li ber derê axa û muxtaran digeriyen, me digot û bî tembûra xwe abûra xwe (idara xwe) dikir. Em pir feqir bûn. Heta me cakêt dikiriya, şalwal di-quetiya, heta me cemedeni dikiriya, pêlav dî lingê me da nedima.

Me ji xelkê gudari dikir, gotin û meqam didane hev û disa me ji xelkê ra digot. Min ji pazdesaliya xwe heta iro gotiye û ezê her bêjim ji, heta ez bikaribum..

Dema hin ew xort bû, Radyoya Bexdayê beşa Kurdi; ji bo dengbêj û stranbêjan leceki vedike. Lî gel M. Arif Ciziri, Kawis Axa, Seid Cizrawi, û Meryem Xan ji serfiraziyê nişandıdım û di

radiyoyê da distirêن.

Piştî ku M. Arif dî radiyoyê da denge xwe da bihistin, li hemû besen Kurdistanê hat guhdarkirin û hezkirin.

Ji bo gelê me, ku tunekirin û helandina wi, ziman, stran û govendêni wi, ji aliyê dewletên kolonyalist da tê plankirin û cedandin, gringiya hunermandan mezine.

Em ji vi stranbêjê gelê meyi hezkiri ra jiyanekê dîrêj û xweşiyê dixwazin.



**CİGERXWIN**

**nemir e ..**

### MUNZUR

Me hozanê mezin û şoresger Cigerxwin salekê pêştä wînda kîr. Meriv nikare bîbêje ku Cigerxwin mûr.

Bî rasti ew bî jiyanâ xwe ya bî tekoşinê dagirti û bî her rîzeke şîrên xwe va dijî û rî nişani me dîde.

Cigerxwin mina dareke çînarê a sedsalini kok û riçal berda nav gelê me û her çar parçen da şîir û helbesten wi destê gelê me da li hember dijmîn wek çekêن hêjane.

Pêkhatina şexsiyata mîrov girêdayî şerîn maddinê. Ji boy Cigerxwin ji ev tişt rasste. Ji ber vê yekê peviste em şerten diroki yên ku dor li Cigerxwin pêcabûn em van raçav bikin.

### ŞERTEN DİROKİ ÇIBÛN?

Cigerxwin salêن piçûk da pişte wendakirina bav û diya xwe bî alikariya dost û gundiyan tê mezinkirin. Salên piçûk da kar û barê axa û şêxan dîke û jiyanâ xwe didomine. Bî vê sedemê ji van salana da zulm û zordestiya axa û şêxan pê dihese, û feqirti û belengazi ciye, jari û bêkesi ciye nas dîke.

Jiyanâ wi dîbe dibistana wi ya rasti. Rojîn hati da ev serboriyen han ên nexwes şîirên wi da wê ciheki fireh bîstînnî.

Perçebûna Kurdistanê ji li ser pêştacûna wi da tesireke baş nişan daye, weki tê zanin sala 1914'an da şerê cihanê yêkemin dest pêkir. Ji ber wê yekê Kurdistan careke din sero bin bû. Gelek kesan gund û bajarêñ xwe terikandin. Cigerxwin ji vê demêda çû li Amude ciwar bû. 1918 anda wexta ku bî desîn emperyalista sinorêñ nûh hatine kîşan-din Kurdistan ji bû çar parce. Amud ji li par-

çeyê Kurdistana Suriyê da ma.

Lê belê xebat û tekoşina wi, tesira şieren wi tu wext dinav van sinoran da nema.

Hemû parçeyen Kurdistanê da şîrên wi bî xurti hatin xwandin û hez kîrin. Pêşketîna xebata diji kolonyalizmê û imperializmê da pêşketîna ziman û kultura kurdi da bûne materyalêñ hêja. Ji ber vê yekê ji ew pir caran kete girtigehan, zulum û tedayen zêde dit. Lê belê tu caran dijmînra seri danani.

Ji ali abori û çandi da paşvamayina Kurdistanê rî nedabû ku Cigerxwin dibistanêda bixwine. Wexta ku kete 18 saliya xwe dest bî xwendîna dîni kîr.

Ji bo temamkirina xwendîna xwe ya dîni li her çar parçeyen Kurdistanê geriya, ev nezik ta naskir. Vê gerê fîrsendek xurt da Cigerxwin ku welatpareziya wi van salan da dest pêdike. Vê wextê pê dihese ku bî navê Kurdistanê welatek û bî navê Kurd mîletek heye. Bî vê hisyarbûnê berê xwe dîde diroka Kurd û ziman û çanda Kurd. Dî vê demê da dest bî şîrên kurdi dîke, dînivise.

Heta salên mîn bûn bist,  
Hij û miji ji nû list,  
Ji nu çûme xwendînê  
Min çav berdan ve dînê  
Çiman ez dibim şivan?  
Çi nabim xwendevan?  
Ji sala bist û çara .....(Şefaq 92)  
Ketim reza hisyara

Êdi ew Cigerxwîne. Pişti xilaskirina xwendîna dîni bû meleyê gund. Bî vi kari han va bî reheti kete nav gelê xwe. Nêzik da adet û usulêñ gelê xwe naskir, feqirti û belengazîyen van nezda dit.

Ji ber ku melletiyê xelkê ra rîyeke rast nişan nedîda û sedeme feqirti û belengazîyen wek qeder nişan dîda, ji vi kari sar bû, dev jê berda û demekê bî çandînyê mijûl bû.

Bî şîrên pêşverû û welatparêz şerê olpresti kîr. Dixwest mela zana û şiyarbin, riya rasti û xilasiyê bîdîne ber millet.

Cigerxwin gelek bûyeren gîring ra bûye hevdem, gelek şerten dijvar bî çavêñ xwe diitiye.

Sala 1925 an da pişti têkçûna serhildana Şêx Seid gelê Kurd zulm û zordestiyen bêhempa dit. Gelek kesen bê guneh bî hoviti hatine kuştin.

Vê bûyerê tesireke mezin kîr li ser Cigerxwin. Vê demê da hîn welatparêzêñ Kurd derbazi Suriyê bîbûn. Cigerxwin van ra bû heval. 1927 da damezrandîna XOBÜN'ê û weşandîna Hawar'da cihê xwe girt û karêñ hêja

kir.

Cigerxwin vê wextê da dest bî xebata rêxistini dîke û heta mirinê dest jî wi kari bernade. Wexta ku mîr ji endamê komita merkezi a Partiya Demokratên Pêşverûyên Kurd li Suriye bû.

Dî şerê Gîridaxê û Dersimê ku bî xwina hezaran şehidan va hate xeniqandin, lî ser gihandin û kamîlbûna hostayê mezînda para van bûyeran geleke. 1941 da faşistên Hitler êriş birin ser Sovyetan. Gelek telefonat da mal û can û bajarvaniyêن cihanê. Wê wextê li Kurdistana Iranê da Komara Mâhabadê saz bîbû. Pişti salekê ev bî hoviti hate helweşandin.

Lî Iraqê gelê kurd bî bedela hezaran şehid, bo azadiye şer kir.

Cigerxwin jî vê şoreşê ra eleqeyeke mezin nişan da û pîr nebori têda cîh girt wek mamoste.

Wan hemû bûyeran lî ser şîire Cigerxwin tesirêن mezin kîrin.

### RÜÇIKÊN ŞIİRÊN WÎ ÇINE?

Cigerxwin hozaneki şoreşger û pêşeng bû. Wi tenê li bûyeran mîze nedikir, ew bî şîiran resm nedikirin. Wi riya xîlasbûnê rawa gel dikir. Bî aşkere tekoşina tebeqi dîda, ber gel û dost û dijminê wan jî dîda xuyakîrin.

Hevalê delal zû bîbin markisi

Bibêjin, bixwinin, bîdin her kesi (Şegaq 137)

Mebêje tenê kurdewari bese

Eve ko li xêra meye Markise (Şefaq 137)

Dibêji, bîbin yek hemi wek bîra

Lî hev parvekin win zevi û pera (Şefaq 137)

Xebatkar û karker bîbin sermiyan

Jî bo me tevabin çî kar û ziyan

Mebêje ko kurdêñ te yek qatekin

Diri û hiri tev jî yek qatekin

Bizane mirov tev du qatin bîra

Lî gora zevi û lî gora pera

Dibêjin ko qata bîlindin lî jor

Divêñ ko li ser me dijin ew bî zor

Meger em li jêrin jî sedi not û çar

Hemi dest qirêjin perişan û jar

Bizan şêx û axa ne kurdperwerin...

Ne xêrxwazin û dîlxwaz ne jî rîberin

(Zend-Avista 141)

Seyda jî durva mîze nekiriye li rewşa gel û Kurdistanê. Daketiye nav gunddan û taxan Gundi û karker şivan û gavan rînd naskiriye. Bî wan ra bûye heval û ciran. Guh daye derd û kulén wan.

Belengazi û nezaniyêن wan ditiye û dilê wi pê êşîya ye. Ew kîrine şîrêن xwe. Şîrêن Cigerxwin da welatparêzi heye, pêşverûti heye, evini heye û hîvi heye.

Şîrêن wi da, birati û aşiti heye. Lî belê ew dizane ku dijmin bî kîfa xwe jî welat naçe der, banga şer jî heye.

Cigerxwin bî şîrêن xwe bû malê hemû feqiran û hemû gelan. Şîrêن wi bûne sembla serhildan û enternasyonalizmê.

Bûyerêñ ku lî heremi û lî cihanê dibûn bala xwe xweş dayê û lî ser raya xwe dîda aşkerekirin, xelq pê hisyar dikir. Lî gora zemânê xwe seyda bî şîrêñ xwe geh li Sovyet piştgiriya leşkerê sor dîke, geh li Vietnamê alikariya gelên Dien Bien Fo dîke, geh li Qorê li hember êrişen emperyalizmê radîweste, geh li ba gelê Filistin fedaiye, pirtir caran jî li Kurdistanê li ba pêşmergeyêñ canfeda li yek senger da ye.

Helbestvanê şoresvan tekoşina gelên bîndest da û her wusa jî jiyanê da cihê jinan rînd dizanibû. Jî ber vê yekê şîrêñ xwe da peyvîn xwe da ev tişt dîda ber çavan.

Keçê rabe seri hilde dîvê çaxe weha nabe  
Binêr jîn çûne ezmana, heta kengê dî xewda

Dixwazîm ku weki min bi, bî dijmin re tu  
dijmin bi

Dî cengê da weki cîn bi, ne rengê bûm û  
kunda bi  
(Kime Ez- 130)

Cigerxwin bî zimanê gel ya rojane nîvisiye. Neketiye nav pozbilindi û kompleksan.

Cigerxwin xwendegehêñ bilind û zanîngeh nexwendi bû. Wi bî xiret û xebata xwe va xwe gîhandibû. Nefs bîçûk û dilsoz bû. Edetêñ gelê kurd baş dizanibû, rojêñ şahi û rojêñ reş da lî ba dostêñ xwe bû. Emrê xwe yê kal da jî dî Yekê Gulanê da, dî şevêñ Newrozê da dî nav refêñ gel da bû.

Wi jî bo Kurdistanêke azad û sosyalist şer kir. Ev roj nedi. Lî şik tune gelê kurd wê Kurdistanê bî timsalêñ wi bixemline. Şîrêñ wi bîbin ders dî dibistanan da.

Em rojekê weha da bo azadiya gelê xwe û aşitiya cihanê dest bîdin hev û lî hember dijmin şer bikin. Hîngê xwestekêñ Seyda wê serkevin û ewê dî gora xwe da rehet razê.

---

# ENCAMA

LECA HELBEST Ú SERPÊHATİYAN  
BI NAVÊ HOZANÊ MEZIN

## EHMEDÊ XANI



Xwendevanên hêja,

Çawa tê zanin kovara me dî nav xwendevanên xwe da, bî navê şairê Kurd yê mezîn Ahmedê Xani leceke helbest û serpêhatiyan vekiribû. Encama vê lecê, em dî vê hejmarê da pêşkeşi xwendevanan dîkin.

Jî bo vê lecê gelek nîvisarên cuda-cuda gîhiştin destê me. Xazma dî warê helbestan da eleqeyeke gelek bîlind hat nişandan. Herusa hejmara xwendevanên ku serpêhati şandibûn ji kêm ne bûn.

Juriya Lecê ji nav nîvisarên xwendevana parçeyêن bijarte hilçini. Mixabîn hejmara xebabtên ku bîkevîne derecê kêm bû. Dî dawiyê da jî bo helbestan, helbesta heval GUNDÎ "Em û Sala 1985 Yan Ahmedê Xani ji Wisa Dixast" xelata yekemin û helbesta heval Vazgal BAZIDÎ "Xani" xelata duwemin girt. Dî warê serpêhatiyan da ji heval Têmûrê XELİL, bî "Mêrxasiya Bûka Rûbixêli" xelata yekemin girt. Dî warê helbestan da xelata sêwemin; dî warê serpêhatiyan da xelata duwemin û sêwemin nehatin dayin.

Bî vê lecê, jî me ra diyar bû ku êdi gelek kes, bî daxwaza efrandin û pêşvebirina xebatên çandi û edebî bî zimanê xwe yê zîkmaki dînivisin. Ev tişteki hêja ye. Em hêvi dîkin ev pêşveçûn her dom bîke.

Em, hevalên ku dî lecê da serfirazi nişandan û hemû hevalên ku efrandînen xwe şandibûne lecê, piroz dîkin.

REDAKSİYONA ROJA NÛ

**EM Û SALA 1985  
YAN AHMEDÊ XANI JI WISA DIXAST**

Sal derbasdîbin wek xewnêş şevan  
Diherrickin wek avêñ çeman  
Newe derin û têñ wek pêlêñ deryan  
    wek bîhar û payizan  
    wek çerxa zeman  
    wek çerxa zeman

**GUNDI**

Ev sala 1985 ye  
Êdi dawiya sedsala bistaye

Temaşedikim lî diroka cihan  
    Lî paşketina mirovan  
Guhdaridikim lî dengêñ pêxemberan  
    Lî bangêñ zana û rêzanan  
Dest davêjim zincira girêkan  
    girêkêñ mezin  
    girêkêñ giran

Jî xwe dîpirsim:  
Gelo çiqas rêzêñ xort û keçan  
    mêrxaz û gernasan  
Sondxwarin bî erd û ezman  
Giyanê xwe dane ser destan  
Ketin nav karvana mayin û neman  
Dîlşaddibûn bî rojêñ felat  
Bo welat...  
Gelo çiqas car bangêñ têkoşeran  
Ketin guhêñ ciyan  
Bûn mîvanêñ zinaran  
    awazêñ geliyan  
Çiqas car hebûn dilanêñ azadixwazan  
Lî ber pesar û kendalan  
Lî havin û zivistanan  
Çiqas car hatin çandin  
    hatin mezinkirin

---

Hêviyên serketinan  
Hêviyên serxwebûnan  
Çiqas car hışkbûn baranêñ me  
Hêñ lî ezman  
Çiqas car çelmişin gulistanêñ me  
Hêñ lî bîharan

Ev sala 1985 ye  
Êdi dawiya sedsala bistaye

Em bist milyonin  
Em bist milyon birinin  
Ka em destan bîdin ser dîlêñ xwe  
Ka em bîcîvin lî ber gornêñ şehidêñ xwe  
Ka em bîpirsin jî xwe  
Gelo ne bese mirna hêviyan  
kûrbûna keseran  
Gelo ne bese giranbûna qeydan  
talbûna jiyan

Ey komêñ hejar û belengazan  
zana û nezanan  
Em kanîn dermankîn birinan  
avdîn zeviyan.. gulistanan  
mezînbikîn dilanan  
bixemlinin gund û bajaran  
Em kanîn bîçirinîn zînciran  
hilweşinîn zindanan  
rîzgarbikîn hevalan  
xaşbikîn jiyan  
xaşbikîn jiyan...  
Em kanîn lî hev guhdarkîn  
bî hev ra dîlsozbîn  
bî yek navi bîn  
bî yek dengi bîn  
Em kanîn hisyar û zanabîn  
bona welat yekbîn  
bona welat yekbîn

Vazgal BAZİDİ

“XANI”

Şêresiyar  
kela Behlûl Paşayê Kurd  
û çiyayê kevîran  
te hembêzkiriye  
Giliç nobedare  
lî gel ehlê Kurdistan  
û te dîparêzin Kurd  
wek du weroja xwe  
Jî çika çavan,  
jî êrêşê neyaran,  
pêşimikê te paqîş dikin  
kevirên turba te  
bî qedir û siyanet radîmûsin  
her roj insan,  
Bî navê te mezîn bûm  
navê te min sond xwar hertim  
tu bo me rêber  
serwêr û zanayı  
dergehê fireh te vekîr  
bo ku em ji milletekin  
bî zar û zîman  
bî ilm û irfan  
bî edep û torene,  
heyiyê me  
jî devki derxist

kire destana MEM û ZİN  
kire heykel nav çanda me  
mekteb medrese te vekîr  
şagirt elîmand  
**NÜBARA PIÇÜKAN**  
te nivisi bo me hemûyan  
kewneperest û zordest  
kit bi kit komkîrin  
pirtûkên te  
û şewitandin,  
nivisarê te yê ser kevîran  
hatîbû neqîsandin  
koledar hildan birin  
danine bin himê mahfîelan(1)  
ku wînda bikin,  
suxtên te  
girtin, lêdan, kuştin  
lê nekarin armancê te dani  
ramanê nav dilan  
bifetisinin...  
Gelek hejandin  
ku fêkiyê te yê  
ser daran bîwaşinin  
neminin  
neminin lî nav erd û ezman

mirazê wan  
lî çavan da ma  
hunermend, niviskar û hozan  
pir bûn, şaxdan  
lî her perçê wetan  
kîtêbên giranbûha derketin  
ji dest çalakêن Kurdan,  
ser doza te kar kırın  
Mehmudê Beyazıdi,  
Eli Heriri, Goran  
metleba te pêşda çû  
bingehek baş te dani  
mamosteyê hêja  
Ehmedê XANÎ  
pesn bo te dîvê  
şayı bo te  
nemiri tu  
her tacê serê Kurdan  
dilsozi welati tu.  
**MEM Û ZÎN**  
xwe berda  
rex Romen Juliett  
tanışta Leyla û Mecnûn  
cih girt,  
bî rasti serfirazın em  
sed eferin bo te  
dersdarê mezin,  
pisporê dûrbin,  
Kalkê meyê hêja.  
**XANÎ,**  
te xaniya çanda Kurd dani  
Mele Cıziri, Hejar  
Heya Cigerxwin  
Lî wê xaniyê da mezin bûn  
xemilandin dorberê xani  
Neqîşandin  
kevirê diwaran  
û serayek hewaskar pêkanin  
bo diroka Kurdistan...  
**Gelê me**  
geleki kevn û şarezaye

û axê welatê me  
xêrdare  
bereket dibarine  
ser hishêن ewladêن xwe  
lema şagirtêن te diefrinîn  
bê westan  
tiştên xweşik û bedew  
Xani,  
lî ser Kurdistanê iro  
kevir kuçik na,  
top û bombe dibare  
lê me gav avetiye bihuştê  
saya serê te  
bihuştâ NÛBARA PIÇÜKAN  
û gîhiştin êdi em  
ji bo Kurdistan...  
Mamosteyê aqilmend  
destbikari, hunermendiya te  
dewlemendiya meye  
pesn bo te dîvê dilan bo te  
nemiri tu  
her tacê serê Kurdan  
dîlovani welati tu  
dîviya bû tirba te  
layiqê te me avabikira  
bî kaxizêن heri xas  
me çap bikira  
efirandinê te  
lê pir nedûre  
tu ji aza bi, rehet razê  
Kêleka Kela Bazidê  
dî nav axa Kurdistan  
qedir qimet bo te dîvê  
cejn bo te  
nemiri tu  
her tacê serê Kurdan  
nişana çanda meyi tu..

1) Gazinoya zapitan

# MÊRXASIYA BÜKA RÛBIXELİ

Têmûre Xelil MÛRADOV

Ringe-ringa dewatê bû li wi gundê kurdai berpala çiya da. Dilanê bedewe qeseng diteyisin, stranêd hesintiji dixulxulin, dilê gişka da fûre - fûra şabûnê bû. Cihan seba gund bûbû gera dewatêye rengin. Bûk teze peyakribûn û ro diçû ava, weki ew husulcemal - tezecana govendê da wê şewqê û ronahiyê bide. Zava tevi hevala henek û laqirdi dîkirin, lê çavên wi mîqerim li dêri bûn. Awa eziza dilê wi wêderêye, nazikayî û ciwaniya xweye nebinayi va vê êvara aşiti dixemiline. Pire dayka wi çiqası hiviya vê demê bûye! Sed heyf, bavê wi ev roj ber çava ne dit.

Nışkêva ji taxa jorin gurmina tîvinga hat, bû hêwarze. Nav xêlekê da her tişt seqizi û fikreke giran çavên hemûyan da vêket: "Dijmin avite ser gund". Dewat, eşq û şabûn ber qeziya bê heyam şûnda vekîsiyan, gund tev lihev bû. Demekê şûnda xortên gund disa go-vend girtin...û berê xwe dane şer. Lê vê care dengê def û zîrnê ser dengê topa û tîvinga ra bû. Lî hêlekê çiya dihejiyan, lê hêlekê nalin ketibû birindara.

Hine malan da şin û gri hêwirin. Zavê ber deri tek - tenê şaso - paşo mayi tîving jî dest piredayka xwe hilda. Wê demê fêza gund da şereki bi kel diçû. Ewi xwe wan ra gihand, lê dilê wi yekser dikewgiri, dientiya. Gelo cara paşin ser dergistiya xwe da vegeviya, têr bîdîta û seba geşbûna gula eniya wêye nûre-neider, ku êdi çîlîmisi bû, disa xatirê xwe jê bîxwesta. Yan na ha...Ki zane?... Lê weki nav tariya xayin da tîvingeke dijmîn emrê wi hetta - hetayê xwe xweş helalke! Ne axîr ev roj roja wi nibû, felekê çîma wa kî, konê wi ji nava kona rakir!.

Hewardor vizziniya gulla bû, qarin û şîrqin bû, rikêf û lêdan bûn. Lê zavê tirê ew gişk xewne, xewneke girane reşehêş. Ewi hema qerede yek-dudu agir kîrin. Careke mayin xwe hesiya. Na, ew gerekê seriki eseyi li malêxe... Bêsebire, tapnake! Dibe yeki dijmîn niha bi fesadi bona çav-bîrûyê belek ber pençerê teliaye.

Pêla xûna şewat serê zavê xist. Meriya tirê ew din û har bûye. Çavê wi li hivê ket, ku gulaver û şîrin-şîrin şewq vedabû. Bê xem, ar-xayin. Fikra wira mina birûskê derbaz bû, weki ew ne hîva rastiye. Dergistiya wi bi desti zorê kaşkrine, ji malê derxistîne, û polikeke zêrên ji ber cênikê fîriye ezmin.

Zavê bi xwe ji tê dernexist çika ew çawa hat-gîhişte mal û dêri xist. Ew cida serdapê dilerizi, pirte-pîrtâ dil bû qefesê da. Hezar tiştîn tevhîev fikra wi ra derbaz bûn. Ber çavê wi reşevehat.

— Ew kiye? ji hundur hêdika dengê terecana bûkin hat. Bin ber zawê da hat, qey bêji ew nûh ji xewa hingorê hisyar bû.

— Ezim, ezim! Ewi bilind-bilind û bi kubari navê xwe da.

Deri nerm heveki vebû. Pêşiyê çîra, paşı serê destgîrtiya hîzkiri bi xêli diyar bû. Zavê xwest xeberde, here hundur, lê cida zendegirti ma. Ber wi qey bêji doteke xelqê nenas bû. Tu hesineke germ kula dilara ser dêmê narin gul neda! Ev çi ecêbe! Dibe nas ne kîr? Navê xwe ducarkir (wekiland, dûmanyî kîr). Disa ew hal...

Lê bûkê ew zef rînd nas kîr. Gava dengê wibihist û deri vekir, deqîqekê, tek-tenê deqîqekê xwest xwe bavêje hemêza wi, agirê sing-berêd xasik nav ramûsanêd wida hevkî vêsinê. Lê nışkêva tê qey bêji teyrok ser dîlê wê da bari.

Eve delalê dilê wê, vir şûnda evê bîbe xweyê nav namûsa wê? Wey la dêranê, û zîravqetayı ji ber gulla reviye, erafê meydanê heval-hogir, qewm-pismam tenê hiştine. Kanê mîrxasiya wiya kurdi? Rûbarê dînyaya mayê-njiyin çîrane, çaxê keç-bûkê êlê sîbê wê qara mîr bîdîne sêri? Ev sosretiya sal-zemana nayê paqîkîrînê. Dengbêjê kîlama da ser şin û şaya qerfê xwe bi wi bikin, lî pêş cîmaetê wi rezilkin. Ax, xwezi gulek lo hîzki pişta wi bikîrta, ew ji nav koma mîra derneketa. Ev çi roj bû!...

Ewê serê xwe bilind kîr, zûr bû dergistiyyê xweyi peşmîrdebûyi nîhîri û bi dengeki sari mîrkêmi got:

— Xweyê gurzê ber cênika min li fêza gund nav şerdane! Tu kîyi?..

Ü deri ber zavê qayim hate dadanê.

---

# **CELADET BEDIRXAN**

## **WEK HİMDARÊ ELFABÊYA**

### **LATİNİ-KURDİ<sup>(1)</sup>**

Dr. Rehber RÊZAN

Çêkîrîna elfabêya latini a nû ku bî vi terzi (cureyi), iro em pê dixwinim û dînîvisinin, encama xebateke dûr û dîrêje, ya ku hozanê kurda Celadet Bedirxan bî şakari pê rabûye.

Ev bûyer gaveke mezine dî diroka çandê kurdi da, jî ber gîringiya wê, wek em dîbinin, emê bî dîrêji lî ser rawestin.

Zimanê kurdi, zimaneki İndo-Awropiye, "jî girûpa rojava jî zimanên İranîye. Wek zimaneki xweser, ne dûre dî serdema Axmêniya da peyda bû ye."<sup>(2)</sup> Jî wê demê da û heya belavbûna ola islami lî Kurdistanê, hebûna elfabêyeke kurdi serbixwe, jî mere ne eşkereye û pîrseke dîjware, hin ne-hatiye lêgerandin. Lê bilimetê jî pênci sali bêtir û bê perwa dîxebite lî ser pêşsistina çandê kurdi, profesor Qenatê Kurdo, rastiyekê diroki pêşan dîde dî benda: "Lî babet niyîkar, ziman û elfabêya pirtûkêt Ezidiyan" û belgeyên berbiçav nişan dîke, ku elfabêya pirtûkên ola ezidiyan pê hatiye nîvisandin, elfabêyeke kurdi serbixwe, netewiye, ne nestûriye û ne cihûkiye, lê "Pêwiste bê gotin, ku elfabê dî bin bandûra pîrinsip û sistêma erebi hatiye rêk û pêk kîrinê". <sup>(3)</sup> Ü ew elfabêya kurdi "Bî temamiya xwe va jî elfabêya erebi ciyawaztire"<sup>(4)</sup>

Dî wê bendê da ji tabloyek bî nîmûnên elfabêyan pêşan dîke, em ji wê raberi xwendevanan dîkin. (Tablo rûp.2)

Pışti belavbûna ola islami lî Kurdistanê dî salêن 30-da ji sedsala 7 a elfabêya erebi cihê xwe girt dî nîvisên kurdi da, tevi ku ne tekûz bû lî gor qeyd û awayêñ fonitiki kurdi û hin nebûna hin tipan. Elfabêya erebi bû asêgeh ji belavkirîna zanînê dî nav kurdan da

---

1) Ev bend me amede kiriye ji lêgerina meya bî sernîvisa "Rola Hawarê dî pêşsistînê çandê kurdi da" - lêgerina diktora, a hati avakirinê lî zanineha Moskova, sala 1983

2) K.Kurdoêv. Giramatika kurdiskeva yêzêka ne metiryalê diyalêktô kurmanci i sorani. Moskova, 1978, rûp.22

3) Q.Kurdo, Govari Kori zanyari kurd, hej. 1. bergê yekem, rûp.148

4) Disa lî wir, rûp.150

<b>ئەرەبی</b>	EREBİ
<b>يەهودی</b>	YAHÙDİ
<b>نەستوریانی</b>	NESTORİYANI
<b>ئەزدی - کوردی</b>	ÊZDİ - KURDİ
ئەرەبی يەهودی نەستوریانی ئەزدی - کوردی	LATİNİ - KURDİ
<b>ئەرەبی</b>	EREBİ
<b>يەهودی</b>	YAHÙDİ
<b>نەستوریانی</b>	NESTORİYANI
<b>ئەزدی - کوردی</b>	ÊZDİ - KURDİ
ئەرەبی يەهودی نەستوریانی ئەزدی - کوردی	LATİNİ - KURDİ

D1 despêka sedsala 20'a da pêlên rizgariya netewi xort dibûn lı rojhelta Navin, d1 jingeya kurdi da gupikêñ hesta (hisa) netewi hêdi-hêdi dîpiş-kuvin. Lı ber pêşrevêñ pêşani ji birewerêñ me pîrsa elfabêke nû ji zimanê kurdi ra derdiket meydanê. "D1 sala 1913 a rêkxirawa Cihandani nivênerê xwe Ebdulrezaq, yek ji neviyêñ malbeta emir Bedirxan ya binavûdeng d1 di-roka kurdi da dişine Petersbûg ji bona danina elfabêyeke kurdi"(5) E.Bedirxan pêrgin dibe b1 I.Orbêli ra (yek ji mezintirin rojhelatnasêñ soviyetê bû) û lı gor fermaña wezirê Derva yê Rossiya I. Orbêli elfabêk dani lı ser hima ermeni û paşê lı ser a rûssi, lê herdu elfabêyan cihê xwe negirtin.

Sala 1928'a I.Orbeli pêşneyari I.Morgolov kır ku alfabeke nû çêke lı ser bingeha latini. (6) Çinkê ew gihiştibû wê dabinê, ku elfabêya latini ji kurdi ra çêtire. Nivisina kurdi b1 tipêñ latini bala rojhelatênasê alman M.Hartman

5) K.Kurdoêv. Akadêmik I.A.Orbêli i kurdevê dêniyê. İstorikofilolojiçiski jûrnal, 1973, No 1 rûp.64

6) Disa lı wir, rûp. 65

(7) ji rakışand bû yê lı Kurdistanê pir salan jiya û jiyana kurdan, zimanê wan baş zanibû; ku ew zimanê rengin û nigadar wê "Herfêñ latini ji qebûl bikit".(8)

Yekemin kovar dı mêtjûyê rojnamevani kurdi da "Roji Kurd"(9) a dı hejmara paşin da bı "Hetawi Kurd" hatîbû binavkîrîn, pironivisek jî elfabêya kurdi ra bı tipêñ erebi dı nav rûpelêñ xwe da weşandibû bı pêşneyariya Abdulcewad.

Lê wê pironivisê nikani bû cihê xwe dı zimanê kurdi da bîdita û hin "Xwendîn û nîvisina kurdi çetin kîr û bala xwendevanan rakşand ser ciyawa ziya zaravan."(10)

Dı salêñ 1919-1920 birewerêñ kurd yêñ bı nav û deng Xelil Xeyali, Mihemed Emin dixebîtin lı ser pironiviseke elfabê, lê xebata wan jî bı serneket.(11)

Pîrsa elfabêya kurdi bala Celadet Bedîrxan rakşandibû hin gava şagirtê dibistanê bû lı Stanbûlê, û lı ser elfabêyên erebi û latini van cûdayan dibine: "Ev elfabêke (a erebi. R.R.) welê ye ku dengin dide xwendîn ku nayine nîvisandin û latini yekcar vajayê wê ye, herfin dide nîvisandin û nayine xwendîn."(12) Ew ramana cihê xwe bêtir ırt lı cem C.Bedîrxan, gava sala 1919 a bı Mêcer Nowel ra çûbûn nav eşîra Rawen, Nowel dixebîti ku hini kurmanciya bakûr bibe, çînkê wi a başûr dizani û C.Bedîrxan hin metehlok, stran û çirok berhev dîkirîn, carîna lı nîvisarêñ xwe vedigerin û dixwendîn. C.Bedîrxan dit ku Nowel: "Bî bilîvkîrîneke biyani, lê bê dijwari destnîvisa xwe dixwend , lê belê ez, heyâ ku min (û) jî (o), û (ı - u) jî (ê - u) htd. derxîstîn, ketûm hezar dijwari."(13)

Çîma C.Bedîrxan bı çetinî destnîvisarêñ xwe dixwendîn? Çînkê wi bı tipêñ erebi nîvisibû û yekser vê bîryara diroki da: "Dı ci da min qerara xwe da û jî xwe ra bı herfêñ latini elfabêyek pêkani."(14)

Yekemin varyanta elfabêya nû jî 36 tipan bû û bı wê elfabêyê C.Bedîrxan kîtêbek elfabêyê û ferhengek bîçûk nîvisand bona çapê: "Lê mixabin ne ew elfabe, ne ji ew ferheng iro ne dî destê min da ne. Dı sala 1925 a da lı gel hin nîvisarêñ min ên dîn gîhiştine heta pêşberê mehkema Xarpûtê."(15)

---

7) Martin Hartman abonê yekemin rojnama kurdi "Kurdistan" bû.

8) Hawar, hej.19, 1933, rûp.2

9) Yekemin hejmara kovara "Roji Kurd", dı 6'ê hizêranê, sala 1913'a derket, hejmara 4'a û a paşin "Hetawi Kurd" dı 20'ê cotmêhê da derket. Sala 1981'a li Bexdadê ma-jîmesta Cemal Xeznedar careke dîn 3'ê hejmarêñ pêşin çap kîrin. Binêr : "Roji Kurd", 1913 bilawkirdnewe û pêşeki û le ser nûsini Cemal Xeznedar, Bexda, 1981

10) O. Vilçêviski. Biblyografiçêski obzor zarûbêynix kurdkîx pêçantníx izdaniv stolêtiyê v sbornikê "Transkiyê yêziki". Kn.1; M-L, 1945, rûp. 154

11) Disa lı wir, rûp.155

12) Hawar, hej.13, 1932, rûp.1

13) Disa lı wir

14) Disa lı wir.

15) Disa lı wir, rûp.2

Xebata himdarê elfabêya latini kurdi ya C.Bedirxan sêzde salan dîrêj kîr, heya gîhêste qalibê dawiyê. Dî paşiyâ sala 1928'an da em lî wê bawerêne ku C.Bedirxan haya xwe jê nebû- lî Armenistana Soviyeti niviskarê kurd, rehmeti Ereb Şemo û kurdnas Morgûlaov "Dîgihînîn deraca paşin bona elfabêyeke nû lî ser hima latini"(31) Û dî destpêka sala 1929'an da, elfabêyê bî kartinin, kitêb û pirtûkên dibistani pê têne weşandîn.

Bî wê elfabêyê rojnama kurdi Rêya Teze dî 25'ê Adarê da, sala 1930 derdikeve (32), û hin hejmarêñ rojnamê dîgihînîn redoksyona Hawarê, dî hejmara 8'an da C.Bedirxan bî kurti hin berheman ji xwendevanêñ xwe ra nişan dîke. Elfabêya latini lî Armenistanê dî sala 1945'an da bî a rûssi (kîrîlik) tê guhartîn (33).

Lî ser elfabêya C.Bedirxan, em dîxwezin rastiyekê aşkere bikin; heya roja iro çi berhamêñ zanisti lî ser zîmanî kurdi derketîne, dî hemûyan da tê gotin, ku C.Bedirxan lî ser bingeha elfabêya tîrki elfabêya xwe daniye. Em nîkanîn lî gel vê rayê bin.

Eger hevduditîna roşenbirêñ kurd C.Bedirxan û T.Weibli encam daba û elfabêyek yekbûyi ji zîmanê kurdi ra danibana, bê gûman elfabêya C.Bedirxan ê ne bî vi rengi iro ba, çînkê wi dilsozi dî her tiştî da yekiti dîxwest û bê perwa lî ser wê rîyê dîçû, çi dî jiyana xwe a siyasi da, çi dî a çandi da, lê bî daxewe yekiti tim ji me bî dûr dîkeve û gava yekitiya elfabêyanî ji her bî serneket, C.Bedirxan, wek em dîbinin bî berhema xwe fêdakari kîr, zanibû ku tîrkan ji elfabêyeke letini çêkirine û dibêje "..hetani ku tîrki elfabêya xwe belav kîrin ya mîn weka xwe dima û têda me tiştîki bingehin ne dîguhart. Mîn her tiştîn xwe pê dînîvisandîn û nasîn xwe ra dîda zanîn(34).

Pîşti belavkîrîna elfabêya tîrki, C.Bedirxan ji xwendevanêñ xwe ra eşkere dîke ku dî navbera herdu elfabêyan da cudayî hene û fêdekariya C.Bedirxan em dî van rîzîn jîrin da dîbinin: "Herweki me berê ji çend caran gotibû, ji bona hêsanikîrîna xwendîna nîvisarêñ me, ji kurmancêñ tîrkiyê ra me dengêñ hin herfan bî hev guhartîn û herçend hebû me ew çend elfabêya xwe xîst nîzingi elfabêya tîrkan" (36). Birewerêñ dilsoz tim Sakarin wek her hêlanvanêñ mezîn, C.Bedirxan ji yek ji hêlanvanêñ kurda ye, nîmûnek geşe dî mîjoyê çandê kurdi da, pîşti sêzde sal xebat lî ser elfabêyê dibêje: " Ez vê elfabêyê ji keda xwe bêtir keda mîletê xwe dihesîbinim û pêşkêsi wi dîkim". (37)

Iro bî saya elfabêya mirê zanînê C.Bedirxan, zîmanê kurdi (kurmanciya bakûr) dewlemend dibe, pirtûk, rojname û kovar têñ weşandîn, lê bî daxewe ne lî Kurdistanê, lî derwayî welat. C.Bedirxan roleke mezîn list dî mîjoyâ çandê kurdi da, bî çêkirîna elfabêya latini kurdi nû û têkoşina wi dî dirôkê kurdi da cihê şanaziyê û serbîlîndiyê ye.

31) X.Çetoêv, Kurdi sovêtskoy Armini, Erêvan, 1965, rûp.119

32) Disa lî wir.

33) Bin. K.Kurdoêv, Kurdsko-rûsski silavar, Moskova, 1960, rûp.835

34) Hawar, hej.13, 1932, rûp.2

35) Disa lî wir.

36) Disa lî wir.

Karbîdestên Tîrkiyê rê nedan û nadîm ku çanda kurdi were vejandin û bî pêşkeve, jê ra yekemin rê ditin, rêya dadgehê û qedexekirinê. Lê himdarê elfabeyê guh neda dadgehan û bîdûrxistinê, xebata xwe berdewam kîr, hin gava lî Elmaniya bû- bîdûrxistina yekemin demeke baş lî ser dixebiti û du ti-pêñ zêde jê rakîrûn û hejmara wan bû 34 tip.

Dî bîdûrxistina duhemin da lî Şamê C.Bedîrxan jî bona tekûzkırına elfabê yê guhdari rayên roşenbirêñ kurd dike û bî dîlxwesi rexneyêñ wan qebûl dike û tipêñ elfabeyê kêm dibin, dîgîhnin 31'an

Bilimetê kurda C.Bedîrxan, gava bîngeha elfabeyâ nû datine, ramana yekitiya kurdan dikir, ev slogan kîribû armanceke serekin. "Dî her tiştî da yekiti" û herweha dî ziman û elfabê da ji "Dî yekitiya zimên da gava pêşin yekitiya herfane"(16) Jî bona elfabê bîbe hima nîvisinê ji her zaraveki kurdîra, C.Bedîrxan bî rexne û rayên kurmancan tenê nekîr, dizane ku zimanza-nê kurdi hêja mamoste û mixabin, em bî dîlşewati niha dîbêjin rehmeti Tewfiq Wehbi (17) elfabeyêke latini çekiriye û dî sala 1930 da lî Şamê hevdu dibinin, elfabeyêñ xwe danin berhev û C.Bedîrxan bî vi şêwayi dîni-visine: "Dî navbera wan da ferqin hebûn. Me dil kîr dî cih da elfabeyêñ xwe bigîhnin hev û jî herduya elfabeyek nû bibjîrin û belav bikin".(18) Lê dest-birayê C.Bedîrxan, wek bî xwe dîbêje, T.Wehbi dîgot hin elfabeyâ min temam nebûye û yekitiya elfabeyan avêtbûn dawiyê (19). Dî pêrra mamoste T.Wehbi vedigere Iraq û pêwendî dibîrin dî navbera herduyan da, tevi C.Bedîrxan çar mehan lî benda bersivêñ T.Wehbi ma, paşê ji C.Bedîrxan ra aşke-ra dîbe wi dilsozi nameyêñ C.Bedîrxan wernegirtine. Û jî xwe derketina Hawarê ji bona bersivêñ T.Wehbi bî derengi ket, çînkê xwediyê Hawarê rî-dana derxistina kovarê "Dî bist û şesê çîriya berê 1931 da girt"(20), lê yekemin hejmara Hawarê dî 15'ê Gulân sala 1932an derçû. Paşê, wek jî kovarê tê zanîn, tu gotin lî ser elfabeyan nayîne kîrin, tevi xwediyê Hawarê dîbe vexwendi lî cejinbûyîna mamoste T.Wehbi lî Bêrûdê dî destpêka sala 1933 a û dî hejmara 26'an (18'ê Tebaxê 1935 an) da bendek T.Wehbi bî sernîvisâ 'Memê Yare'(21) dibinin, pîr mixabin ku ew proja bî serneket. Eger herdu zîmannasêñ mezin bîgliştana bîryarekê lî ser elfabeyek yekbûyi, em bawer dikin, ku pîrsek gîring hel dîbû dî mîjûyê zîmannasiyê kurdi da û rî dîhate gîrtin û projêñ din ra, yêñ hatine danin pîsti elfabeyâ C.Bedîrxan. (22)

16) Hawar, hej.10, 1932, rûp 6 (birê erebi)

17) Mamoste Tewfiq Wehbi dî 3.1.1984'a da lî Londonê û rehmetê. Bêguman ziyanekîne mîzîn gihişt çanda kurdi bî çûyîna wi zanayı.

18) Hawar, hej.10, 1932, rûp.6 (birê erebi)

19) Disa lî wir.

20) Disa lî wir. rûp.7

21) Memê Yare: gireke li nêziki bajarê Silêmaniyê li Kurdistanâna başûr. Helbestvanê kurdi nemîr Pire Mêrd her sal cejna Newrozê li wir dikir û gava rehmeti bû (1950) li Memê Yare hate çal kîrin.

22) Bin. Hamêd Fereç. Rênûsi kurdi le seydeyekda, Bexda, 1976




## DENGBEJ KEREM

## ŞİRETEN KEREM

Olo berxo, iro mîn lî hapa Elaşgirê, li  
tanga Kurdaliya  
Erê, mîn lî hapa Elaşgirê, li Kurdaliya,  
Dengê mîn tê we hemiya,  
Hîn siwar dîbin, diçine dureriya,  
Dîzgina hespa xwe berdine ser bijiya.  
Meriv bigere li gunda,  
Lî navâ gewran û rînda.  
Jîna çê heye, siltane,  
Emrê meriya bî qurbane,  
Qîza ditiyane,  
Rûspitiya malxê malane,  
Evê kîlamê da herkesek dewsâ kewaniya  
xwe dizane.

Ya koti ne derde, ne dermane,  
Ne tê kuştin, ne tê berdane,  
Xwelika sare, rişa pûçe, dikeve stûyê  
mîrkê bisilmane.  
Wexta lî erdê dîkuti, cîsnê kurebeşkane,  
Wexta tu dîki ser çevane,  
Xwe radîkşine der derehane,  
Dîbê, mîrê min ava behrê xwariye, tuka  
wi ji mîn ra şifa û dermane,  
Wexta filiti ew heywane.  
Yar, yar, yar, yar felekê.

Yar, yar, yar, yar,  
tema min lî te be,  
pey nevsê neçe, nevs çetine.  
Hespa xelqê meydanek,  
Jîna xelqê ramisanek,  
Kinca xelkê roj û danek  
Bila şûrê meriya bî ra be,  
Pênc wext nîmêja meriya tam be,  
Sozê mîrkê bisilman soz be,  
Kulfeta meriya gîliyê meriya be,  
Bila mirin rûkê dînê be.  
Yar, yar, yar, yar.



Evan qaydê Evdalê Zeynîkê nin,  
Jî Evla begê ra go: Begê mîn,  
li hapa newala, li Qerquerûtê,  
Pezê te girane, nexşivanek kete bendê û pûtê  
Te jîna xwe niştiye, li pey erzê xelqê  
digeri, kulê malşewitiyo, xelq  
niha li pey namûsa te tê.  
Yar, yar, yar, yar felekê.

Evan qaydê Evdalê Zeynîkê nin,  
Go: "Mala te şewitiyo, dilê min zinare li hewa,  
Şarûl dixûne, bilbil çê dîkin zengilê kewa,  
Mîrkê camêr li xeribiyê, li qurbetiyyê  
bî erza ra ciqa emek bibine, diçe badîlhev  
Ew darê n sîpindarê, serê wan li hewa nin,  
Kokê wan li erdêne  
Heçiyê têne serê meriya, gi qederê xwedêne,  
Yar, yar, yar, yar, felekê.

Dî ser mîrîna helbestvanê Kurd yê mezîn CIGERXWÎN ra salek derbas bû. Jî bo biranîna mamosta Cigerxwin, KOMKAR'ê li bajarê Wuppertal û Ulm'ê du şevê biranînê pêkani.

Dî destpêka van civinê biranînê da, hemû mîvan bo biranîn û rûmeta Cigerxwin û hemû şehidên Kurdistan'ê, de-qîeki li ser piyan rawestiyen.

Nîvîskar Dr.Rehber RÊ-ZAN ji di şevê da, li ser rola Cigerxwin di Edebiyata Kurdi da axaft. Lî ser navê Daire Çandi ya bajarê Wuppertal, Ingo Rash çend gotin li ser rewşa Kurdan kir û piştgiri nişanda.

Bî gotin, dia û helbestan dûr û dirêj behsa jiyana Cigerxwin, xebat û efrandinê wi hate kîrin. Dengbêjê Kurd Kamil, Delal û Seydo helbest û stranê Cigerxwin û yêngelîeri pêşkêş kîrin.

Organa Partiya Sosyalista û Avustralya, "The Guardian" di Çileye Péşin da li bajarê Sydney festiwalek çêkir. Komîn hunermend û folklorê ji gele welatan, ji Soviet Union, Chili, El Salvador, Amîrika, İngîstan, Grêkistan, Almaniya, İran û Turkiyê tevlî vê şahiyê bûn. Bi navê Kurdistanê ji dostêن Partiya Sosyalist a Kurdistana Turkiyê tevlî festiwale bûn.

Hevalan di festiwale da koşeyek ji Riya Azadi'ra vekîrin, tê da neşireten Riya Azadi, yêngelîeri KOMKAR, belavok û afişen li ser Kurdistanê nişan dan

Di festiwale da bi navê "Dengê Serketîne-Stranê Tekoşînê" Cwînek ji hat çêkirin. Hevalan PSKT di hazırlîya vê civinê da ji kar kîrin û tê da besdar bûn. Ji hevalan Fadil ji sérkaran ra du stranê şoreşgeri xwendin. Rojnama The Guardian di rûpela pêşin da ci da wan û ev resmî jîerin neşir kîr.

Hevalek ji Avustralya

## ŞEVÊN BİRANINA CIGERXWIN

Dî vê şevê da zêdetiri 400 kesi besdar bûn û bî ele-keke mezîn guhdari bernama şevê kîrin.



Disa li bajarê Ulm'ê şeva biranînê bî bernameyeke baş hatîbû amadekirin. Ozanê Kurd yê navdâr Şivan, dî şevê da besdar bûn û piştgiri nişan dan. Lawê Cigerxwin Azad ji wek pevkareki dî civinê da amade bû.

gerxwin, stranê tarixi û yêngelîeri pêşkêş kîrin. Koma Stranbêjê Elman "Das Andere Leid", bî elmani û kurdi çend stran gotin. Govendên kurdi hatîn pêşkêşkirin.

Dî vê şevê da ji, jî 600 zêdetir kes besdar bû. Serokê Yekitiya Sendiqayê Elman DGB, hîqê Ulm'ê û nûnerê VVN-Yekitiya Elmanê Dij Faşizmê- ji dî şevê da besdar bûn û piştgiri nişan dan. Lawê Cigerxwin Azad ji wek pevkareki dî civinê da amade bû.

Herwîsa li Swêd, Australiya, Yekitiya Sovyet û li gelek ciyêngîn din, civinê biranîna Cigerxwin pêkhatin.

## LI AWUSTRALYA: FESTIWALA "THE GUARDIAN "



Kandidatê ûlmên tariqê, kurdzan Celilê Celil, xebateke berbiçav dike, dî dereca berrevkirin û naşirkirina zargotina cimata kurdan di.

Nav axiriya Erevanê da ronayi ditiye kitêba "Zargotina Kurdê Rûsyayê". Dî berevokê da nimûnen zargotina Kurdê Rûsyayê - Destanê Evindariyê û ên Mêrxasiyê", "Stranê Evindariyê (Lawîk û Heyran)", "Stranê teriqi", "Bend-Dilok", "Stranê Gêvendê" "Siranê Shinê - Lawiyok", "Mamik-Têderxistonok", "Zargotinok" ciwar bûne.

Bî nimûnen zargotinê Celilê Celil sala 1982'a ji nava kurdê Sûriyayê - Lî Amûdê, Qamişliyê Derikê, Çiyayê Kurda nivisine.

Dî pêşgotina kitêbê da ulmdar dînivise, weki zargotina Kurdê Sûriyayê pareke zargotina cimaeta Kurdaye dewlemende ne paşqekiri ye. Bî reh û binyatê xwe va nimûnen zargotina Kurdê Sûriyayê. nimûnen zargotina Kurdê Türkîyê ne.

Paşi şerê hemdiniyayi pêşin, wexta Sûriyâ kete bin qolê Fransayê, gelek ulmdarên fransız, deb rabûn-rûniştandin, jîyin, zargotina Kurdê Sûriyayê va mijûl bûn.

Ulmdar Rojê Lesko sê(3) kitêb û çend mîgale neşirkirin derheqa ziman, zargotina Kurdan da. Berevokeke wi da usa ji şaxeke beyt-serhatiya "Memê û Zinê" hatine çapkırınê. Rojê Lesko, ku zorgotina kurdê Sûriyayê va hîşmekar dimine, heyfa xwe tîne, weki qewdê dewrana teze da, wexta teknika hucumi nava emrê merîva dike, zargotin tê birkirinê. "Hînek mîrê ji emîrda mezîn ji ortê diçin û pey xwe şagirta nahêlin, hînek ji wana qet tu tiştî nasêwirinîn, yanê ji hostatiya wanê sewrandinê kêm e... Tune roj ku zorbêj tişteki zargotinê wunda neke.."

"Lê gava iro nava kurdê Sûriyayê digeri -C.Celil dînivise,- zorbêja dipirsi, dilê te car dîn baristan dibe, çimki gelek tişt ji wê xezna merifetê û aqîlbendiya zerin, dî nava cimætê da heye.."

Ü aha Celilê Celil nimûnen zargotina kurdê Sûriyayê, ku ewi bernivisine, hazirkirine, bî nivisarnasiya û pêşgotinê va raberi xwendevana kiriye. Vê Kitêbê da 11 destnîvisarê evindariyê û mîrxasiyê, 27 kilamên evintiyê, 10 stranê tariqê, 22 kilamên govendê, 2 stranê shinê, 8 kilamên xebatê, usa ji gelek stran û listikên zara, têderxistinok, zûgotinok ciwarbûne. Kitêb ser donzde para hatiye parevekirinê. Para pêşin da destanê lîrîki-mîrxasiyê hatine cîwarkirinê. Pareke nav destanîn, bî kîlamekê tê gotinê, carana ji dengbêj navbîriyê didine kilamê û bî zarki

şirovedikin. Ev cura qebûlkiri ye usa ji dî nava zargotina cîmaetê cinar da. Ev beyt-serhatiyana ku bî fîkrê filozofiyê reng-awazê nitrandina bejn û bal û guhê mîrxasa, dîdemê tebiyetiyê neweklandi va dewlemend her yek efrandîneke bedewtiyayê tam e.

Dî para kitêbêye dînê da kîlamê evintiyê ne. Eva janreke eyan e dî nava zargotina cîmaeta Kurdan da.

Kîlamê vê berevokê da ji, ku bî hesinê guhê bengi va dewlemend in. Şedetiya hostatiya zorbêjê Sûryayêye Kurd dîde.

Dî para dînê da kîlamê mîrxasiyê ciwarbûne. Kîlam bî vê janrê, ku dî nava kurdan da geleki belabûyine, ser wan qewimandinê berbiçav hatine hunanê, ku dî nava emrê cîmaetê da qewimine.

Dî pareke kitêbê da "Dilok" hatine ciwar-kirinê. Ev kîlamê bî çar xeta bî fireti dî nava cîmaetê da eyan in. Ewana gelek cara he-ma ji cida, ser qewimandîneke têne hunandînê û dî nava cîmaetê da belavdîbin. Ulmdar rast texmin kiriye, weki gelek dilokên ku dî nava zargotina Kurdê Sûriyayê da hene, mi-nani yêñ zargotina kurdê Pîşkavkazê ne. Eva şadetiyyê wê gelek dide, weki dilok, çawa janreke zargotinê geleki belabûyi bûye.

Kîlamên govendê, ku bûne pareke vê kitêbê, janreke zargotina cîmaeta meye hewaskare. C.Celil dî vê kitêbê da 22 kîlamên dî neşirkirine.

Hewaskarin kîlamê derheqa xebatê da, ku pareke vê kitêbê ne. Ev kîlam wextê xebatê têne qedandinê. Bî ritm û qedandina xwe va ew anegori prosesa wê xebatê ne, ser kîjanê ew hatine hunandînê (nandrûn, dehnkutan û yêñ mayin).

Hewaskare para kitêbêye "Stran û listikên zara". Vê parê da ew nimûnen zargotinê ciwarbûne ku mijûli û listikên zara ra girê dayi ne.

Dî kitêbê da usa ji têderxistinok û zargotinok ku tumeri hildayı, janrên zargotinêye hewaskar in, ciwarbûne.

Dî kitêbê da melûmati hene derheqa dengbêj û zorbêjan da, ji kîjanan nimûnen vê kitêbê hatine nivisarê, xebername xeberêne ne-nas heye. Lî kutasiya kitêbê da, bî zimanê û rîsi sercema kurt hatiye daninê.

Bî saya vê kitêbê xwendevanê Sovyetêye kurd nasiya xwe didine zargotina kurdê Sûriyayêye hewaskar, ya ku bê fitiya, wê layiqi guhdariya folklorzana, kurdzana bîbe.

BABAYÊ KELES

# JI NAV WEŞANAN

## " TARİXA EDEBYETA KURDİ-2 "

DI NAV WEŞANÊN ROJA NÛ DA DERKET

Cildê duwemin yê "Tarixa Edebyeta Kurdi" ya mamosta Prof. Qanatê Kurdo, wan rojan ji çapê derket. Çawa tê zanin cildê yekemin ji di sala 1983'an da hatibû neşirkirin. Bi vi awayi ev xebata hêja ya Qanatê Kurdo, di nav du cildan da ronahi dit ghişte destê xwendevanan.

"Tarixa Edebyeta Kurdi" ya mamostayê mezin Qantê Kurdo yekemin berevok e, ku piraniya şair û helbestbêjên kurdi - çı kurmancı, çı ji sorani - têda cih digrin û ew bî zaravê kurmancı û bî tipê latini hatiye amadekirin. Dî van herdu cildên berevokê da, niviskar lî ser 34 şair û helbestbêjên kurd yê navdar agadariyê kêrhati dide û ji helbestên wan nimûneyê bijarte pêşkêşi xwendevanan dike.

Ev xebat li ser sê (3) beşan hatiye parevekirin:

1- Tarixa Edebyeta Kurdi bî kurti. Ev beş ji di nav xwe da hatiye parevekirin li ser çar parçan:

a) Tarixa edebyeta kurdi li nav kurdan da û li Rûsistanê.

b) Rola kovar û rojnameyê kurdan di tarixa lêgerina edebyeta kurdi da.



c) Melümatiyê Şeref-Xan Bitlisi û Evliya Çelebi derheqa zanyar, hozan û şayirê kurdan da.

d) Lêgerina edebyeta kurdi li Iraqê da.

2- Şêrbêj û helbestbêjên kurmancı.

3- Şêrbêj û helbestbêjên sorani.

Çawa niviskar bî xwe ji di pêşgotina kîtêba xwe da diyar dike, ew ne kesê yekemin e ku bî lêgerina edebyeta kurdi va mijûl bûye. Beri wi edebyatnasê kurd wek mamosta Eladdin Seccadi, Refiq Hilmi û hin kesen din, di vi wari da xebatê berjewendi û kêrhati kirine. Lê piraniya xebatê lêgerina edebyata kurdi li Kurdistanê Iraqê, bî kurmanciya jêrê (sorani) û bî tipê erebi hatine nivisandin û di wan da li ser şairê kurmancı ya jorê zêde agadari nehatine dayin.

Ango ji ber van kîmasiyan, mirov dîkare berevoka Qanatê Kurdo - Tarixa Edebyeta Kurdi - wek pencereke nû û mezintir bihesbine ku ronahiyê davêje ser diroka edebyeta kurdi.

## KOVARA " RONAHÎ "

Kovara Ronahi ya ku di navbera salên 1942 - 1945'an da li Sûriyê hatibû weşandin vê carê li Stockholmê ji nû va hate çapkırın. Ev berevoka hejmarên kovara Ronahi ji aliyan Çapxana Jina Nû hatiye weşandin

## " JİN " – CILDÊ DUWEMİN

\* Cildê duwemin ya kovara Jin ya ku bî destê M.E. Bozarslan da ji nû va hatibû amadekirin li Uppsalayê der çû.

## " JİYANA REWŞENBİRİ Ú SIYASI YA KURDAN "

\* Pirtûka Celilê Celil ya li ser diroka Kurdan bî navê "Jiyana Rewşenbiri ú Siyasi ya Kurdan" li Swêdê di nav weşanê Jina Nû da hate çapkırın.

## " ÇEND LAPEREYEK LE MÊJÜY KURD "

Pirtûka diroknas Kemal MEZHER, bî navê "Çend lapereyek le mêjûy Kurd", di sala 1985'an da li Bexdayê hat neşirkirin.

## " PEPÜK "

" PEPÜK" pirtûka şeşemin e di nav rêza pirtükén çirokan yê fabl ku ji aliye M. Emin Bozarslan hatine belavkirin. Di "Pepük" da şeş fabl û çirok ji bo zarokan hatine berhevkirin. "Pepük" di nav weşanê "DENG" da derket, ji 68 rûpelan péktê.

## " KURDÊN GURCİSTANÊ "

\* Lî ser rewşa Kurdêñ ku li Gurcistanê dijin, pirtûkek bî zimanê Gurci li Tibilisê çap bû. Niviskarê pirtûkê Taharê Bro ye.

TEKOŞİNA LI DIJİ NIJADPERESİYÊ  
LI CİHANÊ HER DIÇE BILIND DIBE

TÊKİLİ  
HEVALÊ  
MIN  
NEBE!

BIHA: 10:- kr.